


i vî welatî

aştxwaz ji şerxwazan geleki zêdetir in. Li ser vê yekê, em fikirîn ku bi vê li dijî eniya şerxwazan lazim e ku em eniyeke aştiyê vekin û me weki şekil jî ev kampanyaya îmzeyan munasib dît.

Yên dewlemend jî xwe didinaliyê aştiyê. Sebebê wan hene. Pirsgirêkên wan ên aboriyê hene. Ji ber şer bazara wan teng dibe. Ew naxwazin çavkaniyên aboriyê di vî şerî de berhewa bibin, dixwazin ku ji wan re bimînin. Li gorî daxuyaniyên fermî salê 10 milyar dolar li vî şerî dice. È ku ne ji vî şerî be, wê piraniya vî pereyî wê bikeve bêrika van dewlemendant. Aştxwaziya wan ji ber vê yekê ye.

Rûpel 8-9



Li vî welatî aştxwaz ji şerxwazan bêchtir in

Wêne: Ayhan Bozkurt

- “Li başûr komployek û şerê navxweyi”, hêzên PDK’ê li Avçelaya Silêmanî, endamê Mekteba Siyasî ya YNDK’ê Dr. Sirwan û hevalên wî kuştin. Li ser vê yekê û rewşa başûr lêpirsînek Rûpel 3
- Nivîskarê me MEDENÎ FERHO, di nivîsa xwe ya “Bawesêneka ewrûpiyan” de, li ser helwesta Belçikayê û êrişa wê ya li ser MED-TV’ye radiweste Rûpel 5
- Yekîtiya Nivîskarê Kurdistanê li Kölna Almanyayê di 12’ê kewçerê de hate damezirandin Rûpel 11



Deham Evdilfetah: Çend têbin der barê 'dahûrîna peyvan' de



Aynur Bozkurt: Seid Yusif li Zanîngeha Boğaziçiyê bû



13

Zana Farqînî: Ji cihana muzîka kurdî du berhemên nû

ji Xwendevanan

PÊŞlez silav li hemû xebatkarêni Azadiya Welat dikim û hêvî dikim ku hûn di xwesiyê û pêşveçuna kar de bin û qehümtir bibin û bi hêzîr û zelâtîr hûn dengê xwe bigîhînîn gelê xwe li her cihêkî. Her wiha hûn karibin mijarêne weşanê bêhtir bikin û tiştîn hêjatir diyar bikin.

Ez pîr sa dibim bi weşanêne we û her hejmarek digîhe me, ez dixwînim. Lî nêrîneke min li ser babetañ heye û bi taybetî di warê çand û rewşenbîriyê de ez hêyîdar im ku hûn bêhtir li ser wê rewşê bisekînîn û cihêkî firehtir bidinê.

Careke din spasiya min ji we re

NEZÎR HEBO / JI BAŞURË BIÇÜK

Jİ BER ka bi sedsalan zimanê kurdî hatîye qedexekirin, hêjâhî û berhemên wî yê çandî hatine dizin û talankirin, hetanî vêga tu pêşketin û gesbûnen mezin têde çenebûne, gelê kurd dûrî hînbûna zimanê xwe ketiye û hunerên xwe bi zimanêni biyan pek time.

Di van çend salen dawîn de çend kovar û rojnameyê xwerû bi kurdî têne weşandin, lê mixabin ew jî têrî xwe xwendevanan nabînin û pişti demekê ji ber hinek tengasiyan û bi taybetî ji ber tengasiyan aborî mecbûr dimînîn ku weşanêne xwe bidin rawestandin.

Bi dîtina min divê weşanêne bi kurdî giraniya xwe bidin ser ferkirina zimanê kurdî. Hêviya min ji berpirsîn Azadiya Welat ev eku ew têkiliyê xwe bi xwendevanan re xurtir bikin.

REMEZANÊ HÜRÎ / İZMİR



Der barê Başûr de

MEHMET GEMSİZ

Serê başûrê welêt berdewam e. Em ci navî li vî şerî deyîn jî, ew ziyanê di tekoşîna azadiyê ya vî gelê stembar (mazlûm). Ne tenê li Başûr li hemû besen Kurdistanê û li ferdêne kurd ên xîretdar û şerefyar bandoreke ne baş dike.

Ew rewşa heyî, morala gelê me xera dike.

Qenc tê zanîn ku ev gel bi ci kul û haflî, bi xwe ve hat û rabû ser xwe. Çawa bi xwe ewle bû...

Em dev ji bîr û baweriyêne xelkêne xerîb ên der barê me de berdin, hema em ên xwe bi bîr bînin bes e.

Di nav gel de metelok hene ku Hz. Brahîm jî û Hz. Mihemed jî li gelê kurd nîfir kirine. Lewma, ne mimkûn e ku tu car yekîtiya gelê kurd çêbibe. Bi gotinakin û kurt li gorî wan metelokan em, "gellekî lanetkirî" ne.

Kurd gora hev dikolin.

Kurd cîsnê kewê ne.

Kurd neyârê qewmê xwe ye.

Du cihû hêne ba hev wekî dewletêkar dikin, du kurd bêne bav hev li hev di-

xin û hwd...

Em kurd van gotinan li ser xwe dibêjin. Ev mînak dikarin bêne zêdekirin. Lî ku mirov ji hindikiyê fêm neke, ji piranf qet fêm nake.

Sedemîn van gotinan hene, ew ne bêbiñîne.

Serê du sed salan e ku kurdîn têkoşer, xîretdar û xwenas ji bo azadî û serbixwe-bûna xwe tê dikosin, lê bi zorê gelê xwe ji wan "bîr û bawerî" yan filitand, gelê xwe hişyar kir û kirin ku ferdêne civaka kurd bi xwe ewle bibin, bi xwe, bi hêza xwe bawer bikin.

Ligel vê, hêzên ku li ser herêmê xwedî hesab in, têkilî hêrêmê dibin. Her kes li gorî berjewendiyêne xwe dixwaze ji kurdan, istifade bike. Nemaze li Başûr em dibînin ku her yek kurdan ji xwe re çawa dike leşker û bi wan li hev dixin.

Lewma ji bo kurdan "ji xwe pê ve leşkeren her kesî" tê gotin.

Îcar ev rewşa hanê ya li Başûr dibe sedem ku raya giştî ya cihanê jî der barê me de bibe xwedî bawerîya ku kurd nikarin

xwe idare bikin. Çendî ku ev propaganda yekî impêryalîst û dagirkerî be ji.

Piştiyan gotinan em dixwazin vê biljin: Em tev dibînin bê çawa bûyer û qewmînîn li Başûr bandor û hîkariyê li besen din dike, gelê me ji rewşê çawa zivendi, be û pê dişê.

Digel vê, çawa dikare bê gotin ku he partî û rîxistin divê li parçeyê xwe tê koşê? Nizanim filan partî bakurî ye, bêvan tiştî başûrî ye... ev partû ji aliyê filan partî ve hatîye avakirin û hwd.

Mele Mustefa, li besen din ên Kurdistanê PDK ava nekîribûn? Ev rewş heta nîfatiye rexnekirin?

Ev politika ji ziyanê, ji kuştin û talanê ji koçberî û perîşaniyê pê ve tu tiştî nađe gelê kurd.

Hemû partî, rîxistin û giregirê kurdan pêwest e bi awayekî lezgînî dest bibin xwe û ji vê rewş re çareyekê bibîn û nehîlin edî bi gelê kurd bê leyistin.

Di hejmarêne me yên 33 û 34'an (r. 4) de rîzenivîsek bi sernavê "Der heqê rastnuşena kirdkî de kombiyayışê Stockholmî" hate weşandin. Ji ber kêmagahiye nîvis bi imzeya M. Malmîsanij derket. Ew, nîvisara encama civînê bûye. Ji ber vê yekî hem em ji birêz M. Malmîsanij û hem jî, ji xwendevanêne xwe, lêborîne dixwazin.

Kambaxiya kurdan!

HALIT YALÇIN

Dinya bi pêş de diçû.. Mirovahî li gelek deren dînyayê pêşketin, bajarvanî, teknolojî, pergalen ragihandinê çebûn. Azadî, demokrasi, mafşen mirovan, biratî, dosta-yeti li her cihêne dînyayê di nava mireyan de cih girt. Ziman bi pêş ketin, wêje bi pêş ve cûn. Şoress çebûn serfirazî û serkeftin ji bo wan hat. Şano, helbest bi evînî hatine pêşkeşkirin. Lî gelê kurd roj bi roj ber bi tunebûnê, ber bi qedîyanê ve, ber bi windabûnê ve diçû.. Xwîn, qetşiam, nexweşî, xizanî, betâli, miskinî û tirs ji bo me mabûn...

Mirovahî me roj bi roj kesatiya xwe winda dikirin. Ji kurdayeti, ji kurdbûnê xelas dibûn. Hinek ji me dibûn faris, hinek dibûn ereb hinek tirk...

Gelê kurd ji welatê xwe re biyanî bûn. Kurdistan tune bû. Diviya ku em welatê xwe ji bîr bikin. Ew berê bû. Niha edî pêşketin hebû, medeniyet û se-net hebû, welat ci bû? Em li ku bijîn, di bin ala kê de bin, welatê me ew bû. Ma me edî ci diviya? Ki heta niha bi navê welatê xwe bi ser ketibû? Pêwest bû em ne bibûna pêlistikên helen û erme-nan. "Şêx Seid û Seyit Riza sixûrînîn îngilîzan, Berzencî xulamî almanan, Qazî Mihemed pêlistikê Sovyetê, Mela Mistefa koleyê Amerika û Şahê İranê bû! Ew ne reberen kurdan menfeet-presten mala xwe bûn!" Wiha digotin

Nêzîkî 30 milyon kurdan zimanê xwe yê zikmakî nedizanî, lê hemî kurdan misoger yan farisî, yan erekî an jî tîrkî dizanî. Gava ji wan hate pîrsîn jî bersiv amada ye: "Heval dil önemli değil", "Leyse müşkil-ellisan" an jî "zeban muhîm mist" (Ziman giring nîn e.).

(Ziman giring nîn e!). Çand, çirok, efsane, cejn, mihriran bo me nebûn Newroz roja derkeftina tîrkan bû ji Er genekonê... Edî te ci divê kurdo...

Mirovahî kurd, ji kurdbûna xwe şerm dikirin. Kurd lipaşmayî, qirejî, cilpis, hemal û xulam bû. Ji metopolitan "kîro" "agand" û "xanzo" bû. Li bajarêne biçûk "gundi" bû, nezan bû, cahil bû. Xwendevanê kurd jî li İranê faris, li Iraq û Suriyeyê Baasî, li tîrkîye Tûkoğlu Tîrk" bû. Kûrdêne li Ewrûpa hewceyi netewetiyê nebûn. Her dinê li serban kesî pîrs jê nedikir. Kesatiya kurd wisa pespaye bûbû ku edî Kûrdan na-van kurdî nedidan zarokên xwe.

Li aliyê din, dijiminê kurdan welatê kurdan dişelandin, talan dikirin. Zer û zîvîn welatê me, zenginî û çandînî welatê me, hilberîn û hilberê sewâk-veyikirina me, dibû tank û top û bom-be, dîsa dihate ser me. Serok hebûn di nav me de pêlistikên dijiminan bûn. Pêşkêş hebûn di nav me de zikres bûn. Mîrxas hebûn di nav me de çekhilgire dijiminê xwe bûn. Hizib hebûn, partî hebûn, bizav û grub hebûn, kom û komîte hebûn welatfiroş bûn, birakubûn.

PÎREKA albay Ridvan Özden, Tomris Özden roja sêsemê (14.10. 1996) li ser mirina mérê xwe li Stenbolê civînek ji bo çapemenî-yê li dar xist. Özdenê di civînê de da zanîn ku di kuştina mérê wê de hin şik û gumari hene û got: "Tu saziyên fermî bersiveke rast nadîn min." Paşê diyar kir ku ewê serf li Dadgeha Mafêni Mirovan a Ewrûpayê bide. Tomris Özdenê pirsên li ser kuştina mérê xwe wiha rêz kîrin: "Heke PKK'ê ew kuştibe, cîma rapor û rastî hev nagiîn, cîma defter û ajandaya wî yêntaybet teslîmî min nebûn. Wekî din jî gelek wext bû ku ji bo otopsiyeke nû min serî li dozger daye, lê cîma tu bersivek nayê dayin û tiştek nayê kîrin?"



NÜNERÊ UNICEF'ê yê Washingtonê Abe Pollin, di rojê borî de serî li hin sazî û kesan da û diyar kir ku zarokên kurî bi taşkîyeke mezin re rû bi rû ne. Li gorf agahîyên ku di rojnameya International Herald Tribune de derketin, Nünerê UNICEF'ê dîbêje, zarokên kurî ên başdîri ji ber tûnebûna finançamana hîn projeyan di nava tengasiyek mezin de ne. Pollin di serîledana xwe de wekî pêdîviya herf pêşîn qala tamîkirina şebekeya bajarê Hewlîr û Silêmaniyê û dûre jî kirîha tiştîn ku ji dibistanan hatine dizin, kir. Li gorf gotina Abe Pollin ji bo van her du projeyan 10 hezar dollar pêwist e.

NÛÇE

Li Başûr komployek û şerê navxweyi

Çend roj berî ku YNK dest bi êrişike nû bike, li nahiyeya

Silêmanî Avcîla, Endamê Mekteba Siyasî ya YNDK'ê

Dr. Sîrwan tevî çend hevalên xwe hate kuştin. Ji bilî vê jî disa li Silêmaniyê hinek endamên vê rîexistinê û gerîlayen ARGK'ê hatin kuştin, hinek jî dîl hatin girtin. Derdorêni siyasî vê 'komployê' wekî niyeta PDK'ê ya ji bo êrişkirina PKK'ê dinirxînin. Tê gotin ku tiliya Tirkîyeyê jî di vê êrişê de heye.

Li başûrê Kurdistanê Yekîti Nişti-manî Kurdistan ji nû ve êriş bir ser herêma ku PDK'ê bi alikarî ya hêzên Saddam ji dest wê derxistibû.

Hêzên YNK'ê roja 12'yê kewçêre bajarê Silêmaniyê ji nû ve bi dest xist. Bi vê êrişê şerê li Başûr ji nû ve dest pê kir. Beri vê êrişê bi çend rojan li nahiyeya Avcîla ya Silêmaniyê Endamê Mekteba Siyasî ya Yekîtiya Neteweyî ya Demokratik a Kurdistanê (YNDK). Dr. Sîrwan di gel 4 hevalên xwe ji aliye hêzên PDK'ê ve hatin kuştin.

Li gorî agahîyên Nünerê YNDK'ê yê Stockholmê Karwan Said, li vê nahiyeyê di navbera wan û PDK'yi yê bi navê Teyfûrê Hecî Hüseyîn de xirecir derdikeve, li ser vê yekê, ew diçê Silêmaniyê hêzên çekdar tîne û dora endamên YNDK'ê digire, ji wan dixwaze ku çekên xwe deynin û teslim bibin, lê YNDK'yi vê yekê napejîrînin, lewre ji hêzên PDK'ê Dr. Sîrwan, emdameki YNDK'ê bi navê Hecî dikujin, sê kesen din jî birîndar dikevin destê hêzên PDK'ê, lê paşê ew jî tênu kuştin.

Li aliye din disa li nava bajîr hinek endamên vê rîexistina rizgarîxwaz û gerîlayen ARGK'ê ji aliye PDK'ê ve têne kuştin, çend heb jî dîl têne girtin. Li gorî nirxandina derdorêni siyasî heke YNK'ê êrişî ser PDK'ê nekira, PDK'ê dixwest êrişî PKK'ê bike. Nirxandinê Nünerê YNDK'ê ji bi vî rengî ne, lê ew dide zanîn ku ne ew, ne jî PDK'ê dixwaze li hemberî PDK'ê dest bi ser bi-kîn û bibin aliye kî şerê navxweyi. Lewre jî ji serokatiya PDK'ê daxwaz dike ku li ser vê komployê bi awayekî cidi raweste, meseleyê ronî bike.


Nünerê YNDK'ê Karwan Said balê dikişîne ser serdana Barzanî û van rojîn dawîn jî ya Samî Abdurrahman ji bo Tirkîyeyê. Saîd dibêje: "Ev komploya li diji YNDK'ê bi îftimaleke mezin li ser daxwaza Tirkîyeyê, qet nebe ji bo

dilxweşkirina Tirkîyeyê pêk hatiye." Ew dide zanîn ku Dr. Sîrwan ne mirovîkî ji rîzî ye, lewre ji bi zanatî wekî hedef hatiye neqandin.

Dîsa wî got: "Serokatiya PDK'ê xwe bas nas dike, PDK ne partîyeke modern e. Ne xwediyê ramaneke nûjen e, zêdetir rîexistineke malbatî ye. Gire-girê PDK'ê li berjewendiyê neteweyî nafikirin. Ku ne wisa bûya wê dawî li ser bianîna, li ber avakirina kongreya neteweyî nedibûn asteng. Ji ber vê yekê ew jî bandora şerê PKK'ê ya li ser gelê Başûr û ji rîexistinê wekî YNDK'ê ditîrsin. Ji ber ku xwe naguerînîn, dixwazîn bi fîkî û ramanêna paşverû li herêmî serdestiyê bikin. Bi dîtina min ji sedemîn vê komployê yek jî ev e."

Li ser rewşa dawîn a başûr û vê bû-herê me dîtinê Cigirê Nünerê PDK'ê yê Enqereyê Faîk Nerwiye ji pîrsîn. Wekî ku haya wî ji rîexistineke bi navê YNDK nîn e, hereket kir, lê ji axaftina wî diyar bû ku li ser kuştina Dr. Sîrwan xudan agahî ye. Lewre di cih de YNDK wekî rîexistineke ku bi destê PKK'ê hatiye avakirin bi nav kir. Paşê jî got PDK partîyeke Tirkîyeyê ye, ne iraqî ye, lewre jî cihê wê li Başûr nîn e. Li gorî Nerwiye PDK ji bo ku xwe wekî rîexistineke iraqî nişan bide, ji Yekîtiye YN ji PDK'ê jî DK girtiye û bi vî rengî rîexistinek saz kiriye. Faîk Nerwiye li ser bûyerê tiştek negot.

Li aliye din ji Buroya ERNK'ê ya Stockholmê Yado Roz, ev kirina PDK'ê şermezâr kir û got: "Hêzên dagirker vî aqîlî didin PDK'ê, ew jî gotînîn wan dubare dikin. Heke wisa be Mele Mistefa Barzanî ji bo ci çû rojhîlatê Kurdistanê?" Li gorî Yado Roz PDK rîexistineke Kurdistanî ye û lewre navê xwe wekî Partiya Karkerê Kurdistanê daniye, ne wekî Partiya Karke-rê Kurdistanâ Tirkîyeyê, lê rewşa PDK'ê cuda ye.



Dr. Sîrwan

Li ser rewşa Başûr jî me dîtinê ke-sen ku li jor navê wan derbas bû, pîrsî. Li gorî Cigirê Nünerê PDK'ê Faîk Nerwiye kesen ku ew li dij ser dikin, ne YNK ye, lê belê pastarê İranê ne ku di nav de Yekîneyê Bedîrê jî hene. Her wiha Nerwiye idia kir ku wan cende-kîn hin pastaran jî bi dest xistine, lê nirxandinê Nünerê YNDK'ê bi rengê-kî din e. Li gorî gotina wî, li pişî hêzên YNK'ê pastarê İranî nîn in, agahîyên çavdîrîn Neteweyê Yekîneyî vê yekê diselminin. Lê ew dibêje, dibê ku wan ji İranê çek standibin.

Li ser pîrsa me ya bi şîweyê ev şer wê çawa biqede, cîgirê nünerê PDK'ê tu tiş negot. Bes got: "Berî êrişê, asayî, istikrar û aştî hebû, me YNK qedexe nekiribû, bi tenê me hêzên wê yên çekdar qedexe kiribû, lê pişî vê êrişê dîsa rewş xera bû."

Nirxandina nünerê YNDK'ê bi vî rengî ye: "Em ji mêj ve ji PDK û YNK'ê re dibêjin şer rawestînin, werin

em kongreya neteweyî çebikin, lê guh nedan me û rewş li ber çavan e. Hêzên wekî Iraq, Iran, Tirkîye û Amerîkayê ji vê rewşê sûd werdigirin. Divê Kurdistan nebe wekî Lubnanê. Heta PDK û YNK li hev neyên, bi PKK'ê re hêzên xwe nekin yek û daxwazîn xwe negî-hînîn cihanê nikarin tiştekî bi dest bixin. Iraçî ji vê rewşa dawîn sûd wer-girt, tu car bi Iraçî bawerî nabe. Her wiha İran û Tirkîye ji naxwazîn kurd tiştekî bi dest bixin. Heke kurd nebin yek, nikarin li Başûr otonomiyê ji bi dest bixin. Hêzên wekî Tirkîye, İran û Amerîka dixwazîn şoreşa ku li Bakur dest pê kir û li hemû Kurdistanê belav dibe ji holê rakin. Lewre jî dixwazîn wekî kewçêra 1992'an hêzên kurd li diji PKK'ê rakin. Lê rewş ne wekî berê ye gelê kurd digel ew qas teror û çew-sandina her du aliyan jî dev ji doza ne-teweyî bernade. Ne tenê hukmê Sad-dam, otonomiyê ji napejîrine."

SAMÎ BERBANG

"Ena çalakiyi heskerdena jiyan a"

Serekê parti rê. Ez serî 1972 di merkez a şerhê Meletiya di hama dinya. Namê mi Zeyneb Kinaci yo. Ez bi eslê xwi dewda Elmalî ra ki girêdayey merkez a Meletiya ya. Namê Eşireta ma Mamûrkî yo. Min Meletiya di Zankoyê Inönü beşê rêberi û şewirmendeya Psikolojik wend. Verê ki ez dekwî yo refdê organizasyon a neteweyî miyan. Mi nêwes-xanêdê Meletiya di zey teknisiyenê rontgeni kar kerdê. Ez zewijnayeya û mîrdê mi Amed ra, merkez a Egil ra, dewda Ixliyan ra wo. O zî eyni beşê unîversitî ra mezûn o.

Mîrdê mi zimistan ê 1995 di, şerhê Edena di wexta ki xebeta cephî kerdênê, esîr kewt destê dijminî. Hetê madî ra weziyetê malbata mi normal o. Bi sînor bo zî, ez tikêkê serbest gird biya. Wexto ki mi hema lîse di wendêne, bîrûbawereya çep û kurdiyi tesirê xwi mi ser o kerd. Mi enê seran di dest bide kurd û bi çimêdo rexnekerde jiyan ra hewniyaya. La, ez nizdiyê tew yew organizasyonêda siyasi nebiya û nêkewta xebati miyan. Wextono ki mi zanko di wendêne, fikir û mîlê min o çep temamî zelal bi û sempatî yê mi PKK'î rê zêde bi. Malbata mi her çiqas peydi menda bo zî, la meyîldarê hîsê kurdiyey bî. Ena yew ra meyîlê min o kurdiyey over şînê. Aw wext menîqa ma di welatsînoxey bi organizasyon nebi. Pêşençey (rêbere) çinê bî. Rana weziyetê malbata mi a madî bi sebe ki ez binney pey di mana. Wextî miyan di fikrê mi gird û zelal bi û dim ra ez kewto refdê tekoşını (mucadeli) miyan.

Seri 1994 di, şerhê Edena di mi enî (cephî) miyan di dest bi xebat kerd. Gorebê serêki mi xebata xwi domna. Mi eno wext di xwi rind perwerde (talîm) kerd û over berd. Seri 1995 di, mîrîqa Dêrsimî di ez kewta refdê ARGK'î miyan. Refdê ERNK'î miyan di mi sere ra heyânî cêr jiyan xwi, xwi çim ro viyarnay û şexsiyetê xwi şinasna. Şexsiyetê mi di iqnabiyyayî û zanebiyyayî over kewt. Ez şena vaja ki hetê idi, a qerardayoxey, moral, zelalbiyyayî û zanetey ra ez quwetir biya û over kewta.

Têkoşına ma serekeyda PKK'î di her ki şî xurt bi û heme insanstey rê mal bi. Ena mileta ma ya ki bi temamey hameybî înkakerdiş û bêşexsiyetmen-diş, dîrok (tarix) di raya ewîli serehe-wonaye û serifiraz biya. Rana zî ena mileta ki degerê jê ya neteweyî, rih, kultur û şinasnamê ja hame bi înkarkerdiş û imhakerdiş û kewtbî bindestê dijminî, ki bêşexsiyetkerda bibî; bi ena tekoşîn, yewna ray şiyar bî, zana bî. O, bi wahîrê cesaretey, qahremaney, zanaye û mesûlteya girdi girot mildê xwi ser. Ena mileta ki hîsandê welatsînoxey ra dûrî, dijminî rê viye verdi ameye û bendewar, bê heri û bê welat, terefê zor-



Tabloya Wênesaz Reşad Yûsif (Zeynep Kinaci)

destanê dîrok ra hema wirdikerdiş, pelixnayîş û incirnayîş, ki heta eyro serekey û zanayeyê xwi nê raştî nêwetbî meydan, welatêdo xirabe û wêran mendbi.... Viraştox û serekê PKK'î Apo eno weziyeto serebin û negatif, bin ra bedilna. Mileta kurd ne tenê bêşinasname bî, mezgê ja zî, semedê iş-xalciyan û karbidestan xebitiyayê û

Mîrdim wextono ki dîroka her neteweyî ra hewniyeno, bi taybetî dîroka şoreşdê jîni keneno, raştê serekdê jîni yeno ki şer keto, têkoşan û reyidê rizgarî di rolê xwi no gird kay kerdo. Dîrok, him semedê organizasyonanê azadiwaştoxê neteweyî, him zî semedê çinî (sınıf), rind nawnawo û zelal kerdo ki, bê serekey, ê rizgarî nebiyê û ser nê-

Enê averşiyayışê ki dîroka Kudistanî di viraziyyâ berhem (eser) û encamê kedê serekî yo. O, bi xwi serçimê heskerdeni, quwet, yewînîgirotîş û yewbiyayen o. Jê şexsiyetê xwi di profilê mîrdimêdo newe viraşto. Jê daw ispatkerdiş ki mîrdim şêno xwi newe bîko û over fino. Eyro lazimey û weziyetê şoreşê Kurdistani "Ma semedê serkewtiş û azadî dekwîye refdê kurûmendê parti, artêş û cephî miyan"

kewtbî xizmetê quwetê peydîmendan û împeryakîstan. Jê mileta kurd eno hewndo merde ra hişyar kerd, warazna lingan ser, semedê xerîban nê, semedê jê ked tekoşîn û şerî azadî miyan. Şîrzanawo kurd o gird Ehmedê Xanê veto ki: "Eger serekê ma yê duristî û bi namûs bibinê, ga ma zî nêbînê esîre ereb, ecem û tîrkan". Serekê kurdan ayê ki sextey, heta enkay menfetê xwi no şexsi malbatî û eşîrtey daynê over, jîni milet û dîrok a Kurdistani di, eno weziyeto naletbiyaye, wextêdo dûr û derg û heta enkay domna wo.

kewtê. Serekey, hetê newekerdiş û ovekewtiş di en merhelo berz di temsileya temameya organizasyonî keno. Serekey semedê însando newe, fikirdo newe û cimhatêdo newî rê, heme jiyan xwi eyar û pêşkeş keno. Jiyan xwi gorebê jiyan mileti eyar keno, çerenûtiş û serkewtişê xwi çarenûtiş û serkewtişê mileti di veyneno. O, waştox û hêviya mileti xorîneya mezg, zerî, rih û leşa xwi di bi his keno û ca dano. O, semedê rizgarî wezîfe û mesûltey qatêdo berz di gêno xwi mili ser û ano ca:

Mileta ma rê heqê jiyananda raştî nê-

memdo, heme het ra hama qedêneyî û qeliyayîş. Dinya di ti yew mileti zey mileta ma raşteyda xwi ra niyama dîrekewtiş û semedê xwi biya xerîb, deger û qîmetê ja wo neteweyî, kulturî, sosyal, cimhatey hamo lewtiş... eno weziyeti ver o helbet lazim o ki serekeya PKK'î ê ay bînan ra ciya bo. Eno weziyet û hawa di, serekeya parti heme het ra û bi taybetî zî zaftir newe, bi rih û overkewte û jiyan xwi heme şoreşî rekerda nobeti û dekerda xizmeta mileti. Raşa jê zî, PKK û serekeya jê wahîne enê teybetiyandê corênan a.

Wexono ki mîrdim dîrok a şoreşdê cihan ra hewniyeno, him mileta ki şoreşê neteweyî û him zî û çinî kerdo, ê wahîrê zaf imkanandê dîrokî, cimhatî, çinî û kulturî bîyê. Înkarbiyyâşê jîno neteweyî nebiyo. Problemê jînê şexsi zey ê ma gird, wirdi û xorîn niyê. Dîrok a jîni hindi jîrdestey, bindestey û tahta nêdiya û tepakewte nêmendê. Dîn hindi ki ma miyan di bi xirab hamo kar ardiş, jîni miyan di niyamo bikaratdiş. Ay miletê bînî bi gorebê weziyetê xwi dijmindê xwi ver o reaksiyon nawnawo. Jîni miyan di tay bo zî azadî û sepiyey biya. Serek û rêberê jîni tay bo zî, roşinbir û zaneyandê xwi ra zaf fayde, paşti û ardimey veynaya û girota.

Serekeya Partî raşteyda zaf tenike vejiya wo rayîd. Fikir û nizdîkbiyayış jê persê dînî, cenî, şexsiyet malbatey ser o zaf bi zanayîş û ca dê xwi do. Serekê şoreşê Rusya Lenîn bi xwi persê cenî ser o, sererasteya hewli û raştî nêrarda ziwon û meydan. Viraştişê artêsa (ordi) cenîyan, viraştişê kongra û konferansa cenîyan, dinya di tenê dîrokda şoreşdê ma di biyo û pratik di hamo ca. Ferq û rengê jiyan serekey, xorîney, hîşkewte, helwestigirotox, verniya xwveyneye, bi quwet, hunermendeya qalikerdiş û şîrovekerdiş, duristey, tecrübe û zanibiyayışedo zanaye, ki şexse serekdê ma di esto, mîrdim nêşeno bi ti yewna serekî reydi biyaro têver û muqayese biko. Hedişanê dogmatikan ra nêhewniyeno. Serekê ma raşteyâ Kurdistani, şoreşê cihanî weş analîz kerdo û encam û ders jîna girot û gêno. Ene kokî ser o kokê şoreşê kurdistani viraşto. Neki bi awayêdo (şekil) teqlît, kopya û dogmatik, hetanî ki ti vajê bi awado afirandêr jîna ders û tecrübe girot. Sosyolîzin zaf hewl analîz kerdo û gorebê merc û şertî mileta xwi encam tira voto û nika zî bi awayêdo zanaye jiyan pratik di je bi kar ardo û ano.

Enê averşiyayışê ki dîroka Kudistani di viraziyyâ berhem (eser) û encamê kedê serekî yo. O, bi xwi serçimê heskerdeni, quwet, yewînîgirotîş û yewbiyayen o. Jê şexsiyetê xwi di profilê mîrdimêdo newe viraşto. Jê daw ispatkerdiş ki mîrdim şêno xwi newe bîko û over fino. Eyro lazimey û weziyetê şoreşê Kurdistani "Ma semedê

serkewtiş û azadî dekwiyê refdê kurû mendê partî, artêş û cephî miyan". Eno weziyet, heme persê tali û şenik dano yew kinar, raşteya weziyetê miletä kurd û dijminî, bi yew awayêdo zelal û bi çiman ver, bi kokêdo temamî ano meydan. Na ra tepiya, heme miletä kurd û bi milyonan mîrdim bi zerweşeyâ germi hemêz keno, jîni keno xizmete şoreşê rizgarî ya neteweyî û sosyalizmî. Eno têkoşin û şero erciyayewo ki bi des seran, komara Tirkiya faşisti hetê eskeriya, siyasi, aborî û çandî ra kerda krîzêdo xorîn û girdî miyan. Ena bîyo ki, a eyro bêçare menda.

Eno weziyeto newewo ki ma çirûskanê serkewtişî veynenê, hêvî û bawereya miletî ma ra vêşer biya. Gerek ma gorebê jiyan û bîrûbawereya serekey û têkoşina jê xwi hedrekê û bersiva (ce-wap) wextî bidê. Bi heme quwet û zanebiyayışê xwi mesûlteya xwi bi ca bîyarê. Ma zaf rayan rexne xwi gênê û vanê ki: "Şexsiyete burjuvaziyo şenik, dewijey, bîrûbawereya feedalitey û şexsiyete dijminî û tesîrê şerê taybetî ma sero viraziya wo, yan zî esto". Hêdîna weş haseno ki ma bi rexnegirotişanê anasarênan over nêkuwenê. Bi gorebê mi, rexne girotiso en raşt û ca di pâratikê ma wo. Dijmin bi awayêdo temamî ma ser di yeno, erişê ma keno. Lazim o ki ma zî, bi heme quwetê xwi dijminî ser di şorê û bi dijminî bidê hîskerdiş ki ma bi qerardarey û bi bîrûbawerey, berdêlê azadî danê û xwi eno râyid di fedâ kenê. Wexta ki mîrdim dîroka têkoşin ra hewniyeno, PKK bi

Wextêdo ana di, ki dijmin wazeno serekdê ma ver o sükastêki virazo, cewabo en erciyaye eno yo. Dijmino gêj û xînt, bi eno şekil eylem go gêtir û xîntir bibo. Eylemêda bi eno reng, her ca wa ki dijmin weyra wo ca û dorme jê ro teng keno û welat jê ro keno zîndan û goristan.

gehremaney, xwiveroda-yîş, ked û xebat, bîrûbawereya ana gird û girîngî (muhîm) veta meydan ki, enoya dûrê hêş û aqîlî yo. Xwiverodayış kokê karekterê PKK'î yo. Lazim o ki ma eno mîraso bimbarekên û dîrokî ro wayîr vejî yê, bipawê û wezifanê enê wextî biyarebî ca. Nika wext wextê eylemandê intîxarî yo. Eno lazim o. Eno averşiyayışêdo taktikî yo. Eno şikil eylem, moralê dijminî xirab keno, jê fine-no û moralê ma zî zaf xurt û berz keno.

Wextêdo ana di, ki dijmin wazeno serekdê ma ver o sükastêki virazo, cewabo en erciyaye eno yo. Dijmino gêj û xînt, bi eno şekil eylem go gêtir û xîntir bibo. Eylemêda bi eno reng, her ca wa ki dijmin weyra wo ca û dorme jê ro teng keno û welat jê ro keno zîndan û goristan. Hetê ma di zî moralê miletî weş beno, moralê heme şervanânê ma zîxurt û berz beno. Dost û dijminî ma yewna ray veynenê ki, ma dozda xwi ser o çiqas bi qerarî û rayîdê ena doz di leşandê xwi di bombayan teqnenê û bi ena yew, berdêl û degerê azadî danê. Ma bi pêşengeya eno şekil eyleman, waştoxeya azadiya miletê xwi, bi temamê cîhanî nawnenê. Bi reng û şekil, bi eylemandê anasarênan ma şer

xurt û hera kenê, bi lez û organîze ke-nê.

Serekê min!

Ez xwi semedê eylema intîxarî endam veynena. Ma eno ked xebata şimaya xorîn, wîrdî û erciyaya di leşa xwi feda bikê zî, indi çido zêde niyo. Eno tayo û qîm nêkeno. Wereka biliyê can û leşa ma çiyêdo ma yo bin zî bibînê, ki ma bidaynê. To bi jiyanda xwi netewyêdo newa viraşt û jîndar kerd. Ma ese-re to yê. Ti garantiya heme miletä Kurdistani û cîhanî yê. Jijano to semedê ma şeref o. Heskerdeni, cesaret, bawerey, quwet û şeref dano ma. Heme miletä Kurdistan û bi mîlyonan mîrdim, semedê merdişî emrê to do. Eno cazibîyayış to, ma zî gêno bindê tesîrdê xwi û kaşkeno têkoşini miyan. Wextandê zaf tengan û zoran di eşq û heskerdena to kuwena zerda ma û ma hewil danê ki tira maneviyet û quwet bigiyê. Awo ki herî zêde rûmetê şehîdan zano ti yê. Eno sedem ra çimê ma peydê ma di akerde nêmaneno. Ez ca ardişê ena eylemi xwi rî yew wezîfe hesibnena û xwi tira meshûl veynena. Ez kemîkerdiş û wertera hewonayışê kîmaneyan-dê xwi, şer û gurkerdişê şerî di veyne-na û ez bawera ki gerê mîrdim enê we-

zîfi bi ca biyaro. Ez wazena ki xwiverodayışê enbaz Mazlum, Xeyri, Kemal, Ferhat, Besê, Berîtan, Berîvan û Ronahî ro wahîr vejiya û rayîdê jîni bisopna. Ez wazena semedê azadî bîba vengê waştena miletî.

Politika imperializma ki cenî deke-na kole, ji verro ez bi hîrsêdo gird bomba leşda xwi di teqnena û wazena bi ena yew bîba sembol û nîşanê xwiverodayışê cenîya kurd.

Ez semedê jiyanî wahîrî idîayayêde zaf gîrda û wazena bîba wahîr jiyanêda bi rûmet û eylemêda girdi. Pêşenge-ya serek Apoy di têkoşîma ma ya rizgarî ya neteweyî wextêdo zaf nîzdîk di go serkewo û mîletê ma ya belengazi go cay xwi no erciyaye malbata mîletê cîhanî miyan di veyno û bireso mafde xwi.

Eno kokî ser o yewna ray ez nîzdîbi-yayış û sedeqa-tê xwi semed serek Apoy, heme şehîdê Kurdistanî, enbazê ma yê ki zîndanandê, mîletä kurd û he-me mîrdimatey rî dana nawnayış û soz û peymanê rîzgirotişi dana. Semedê jiyanî idia mi zaf gîrda. Ez wazena bîba wahîr jiyanêda bi rûmet û eylemêda girdi. Semedo ki ez jiyan û mîrdimatey râza zaf hes kena, ez ena eylemi ana ca.

Bijî Serek Apo

Bijî têkoşîna ma ya semedê riz-gariya neteweyî

Bira bîmro dewleta tîrk a faşîstî!

Hezîran 1996

Zîlan (Zeynep Kînaci)

TADAYOX: MIHEM HİMÎBÊLIJ

Bawesêneka ewrûpiyan

MEDENÎ FERHO



Bawesêneka Ewrûpayê xeta ber xwe li gorî berjewendiyê bazîrganî û têkîlîyê danûstandinâ mal û mewdan geh bi vir de geh bi wir de dide. Bi dorêl... Geh Almanya, geh Fransa, geh Belçika, geh İngilistân... Îro, dora bawesêneka Belçikayê ye, bi livandinek ne pelweşen dilerizîne. Mixabin bawesêneka lerizandinê, pelan neweşîne jî û nikaribe bîbe babîsoka giriş û bênderwêran jî, dibe dilêşîn û weytiya arşîv û destnîsan.

Bi rastî di hêla arşîv û destnîsan de gelê kurd xwedî bextreşîyeke dîrokî ye!.. Dijmin xweş fêm kiriye ku bes di vê hêlê de dikare gelê kurd bênasname û bêsilûk bike. Èrisen, xwe li ser bingehê xurt kirine, heya çend salêن berê jî gîhabû armanca xwe jî... Niha dixwaze careke din van îmkanenê ku ji dest derketine bi desten xwe bixe, hew dikare... Bi dost û mirovîn têkilî xwe, bi berjewendiyêke pir mezin, bi xap û rîpêñ pir kirêt û şermî vî karf dimeşîne.

Èrisa ser MED TV'ye ku çapemeniya Belçikayê, ne bi temamî be jî rastî û pêlêkirina mafen mirovan nîşan nedî, bêtereziya xwe winda kir, her nîvîs û gotina hate xêzkirin, bû rûresî ji çapemeniya wan re. Em kesen xwe rojnamevan dihesibînin, yan jî nêzîkî vî karf

dibînîn, ked û xwêdan û salên xwe di vê hêlê de xerc kirine, dilwêran, kezeboşû kirin. Edî xuya ye ku mafen mirovan, demokrasiya ku ewrûpi ji xwe re dikine al, galegalen ber kuç û hêtan in. Komên hişyar û xwedî hêzên mafdar di bazara çarçî û kolanen bi berdaxên kîstîlî de ku şampanya zerava mîr-a talîşkî ye têrde, bi xaliya roniya cam û zelaliya ava tîn ku tevlîhev dibe, dicîrisê. Ew çîrisin jî li ser lîvîn müwekî û ji ser hev û din şemît, ku bi kenê xapandînê sil û demûşî dibe, dimîne.

Gavekê ji wan dîwan û eywanenî bi weşîyen gîlgîlî û têrampul têne ronîkirin, dûr nakekê. Helbet mafen mirovan ne avakirina qesr û xaniyêni li wêraniya Kurdistanê ye. Avakirina xanî û quesran karê herî hesan e. Bila dîwletên ewrûpi me jî, xwe jî nexapînîn... Heger hînek kesen ji wan eywan û dîwanenî têr ronahî û awîren mîlîl ên têr nîrûmêkî dûr bin û gavên xêr û xératan biavêjin jî, nabe sermezinahiya wan. Sermezinahiya wan kesan bi tenê ye!.. Kes ne kom!.. Mirov ne

Tîştek dimîne di desten kurdan de: Pêwîst e ku xwe ji nava rekîha dubendî û komîckî xelas bikin. Hewn û raman çibe xwe ji tev-gasîyen kesayefî xelas bikin, li dor neteweyetiye mafdar bin, xwedî deng û awaz bin. Gelê kurd ci kişandibe ji desten rîzan û serok û rewşenbîrên xwe kişandîye. Di galegal û axaftinê de her kes yekîtiyê dixwaze, her kes li hemberî dubendîye derdiikeve... ku piş dane hev, der heqê hev û din de dest bi kîlmemâni û gotinê kelevajî, têrtawanbarî dîkin. Ku gîhane ba hev û din tingîn hev dişemîtinîn,

rexnîyan qebûl naakin, ji bilî xwe rastiya tu kesen din nabînin.

Komen xelkê ji baweriya xwe winda dîkin. Ev nakokî dibe sedema belabvûna me. Belabvûn jî wekî pezê ku gur bikeve nav birîndar û bêstara, têrtîs e.

Béguman iro wextê hilweşandina gunehan e. Mirov çawa ji gunehan xalî dibe? Guneh çin e?... Béguman guneh, ne dewlemendî ye, ne belengazî û feqîfî ye... Béguman ne qesr û qonax in, ne willa û malek pir delal a raxistî ye; ne cil û kîncen nû utikirî, qirawat girêdane ku gelê mirov di nava tengasiyekê bêhempa de be, mirov jî xwe rewşenbîr bîbîne, rewşenbîriya xwe bi galegal û kîlmemâniye ser maseyan û enîşkîn qehwexanen pêk bîbîne...

Tawanbar dibe, navê vê rewşê gunekarî ye. Ev yek. Mirov, ku hêzékê bide dûv xwe û her kesi tawanbar bike, her bi şaqî û dûrxistina ne berjewendiyê gişî, bes kursiya xwe biparêze, tawanbar dibe, navê vê pêkanînê gunehkarî ye. Berî her kesi rewşenbîr, tev bi gişî bila kumên xwe deynîn ber kaba xwe û bi xwe bişewirin û ji mesûliyeta xwe nerevin. Ev jî wê bîbîne sedema weşandîna gunehan. Hingî rewşenbîrên kurd dikarin bîbîjîn emê bigîhîn qonaxeke xurt û ges.

Not: Yekîtiya Nivîskarêñ-Kurd divê ku nemîne di rekîha teng û qalibî bisinor de. Divê ku ew bîbîne derfîstanê berhembeziya gişî. Bar giran e, grub û komîck nikarin vî barî, ku tawanbariya dîrokî tê de heye, hilgîrin.

Çend têbinî der barê

'dahûrîna peyvan' de



Deham Evdilfettah

h

Di rojnameya Azadiya Welat, hejmara 29'an de, mameste Zana Farqînî gotareke morfolojîk, bi sernavê "Dahûrîna Peyvan" nivisiye. Di wê gotarê de, mameste Zana bingeha parvekirina çend peyvîn hevedudanî (hevbend) rave kiriye. Ew peyv ev in: Birazî û xwarza, kengê, kebanî, melkemot û çawa.

Ez bi vekolîn û şirovekirina rîzdar Zana geleki bextiyar bûm. Lî, di nêri na min de, hindek pirs li dora wê xebata gîring peyda dibin. Ev jî, tiştekî siruşî (xeristî) ye. Çimkî ci karê heye di destpêka xwe de bêşâşî, sergihayî (tamam) nabe.

Berf ku ez nêrin û têbîniyên xwe di babetê de berçav bikim, "ez dixwazim spasiya birayê rîzdar Zana Farqînî bikim, bo vî kar û barê giranbuha ku daye ser milen xwe. Spas, ji bo berpirs û desteka nivisaren Azadiya Welat jî, ku ev derfet dane rewşenbir û niviskarêne wefet."

Peyvîn ku emê li ser wan rawestin ev in: Birazî, xwarza, kengê. Yen mayî, bêguman, zelalkirî ne.

Teqezi, ez nizanim, ka ev her du bêjeyen jorîn, li herêma Farqînê yan jî li herêmine ditir, wekî ku hatine nivisîn, tene bilêvkirin an na. Çimkî, ev her du bêje (birazi, xwarza), bi vî şeweyê nivisîn, vederî rîzan (qeyde) û rîpîvana zimên hatine. Ji ber, vê egerê jî, mameste Zana ketiye hindek şâsiyan, di vekolîna her du peyvan de.

Birazî:

1) Mameste Zana dibêje, ev bêje hevedudanî (hevbend) ye. Ji "birazî" pêk hatiye, "bir" naskirî ye, (zî) ji lêkerê "zan", "zayîn" ye.

Parvekirina peyvî cihgirtî ye. Lî parçeyê ji "zan" ye hatiye çîma "zî" ye, ne "zê" ye? Peyva "birazî" hevedudanî ye, ji navdîrê "bira" û binyata lêkerê "zan" ye pêk hatiye.

Yek ji rîzanen damezrandina navê hevbend (hevedudanî) di zimanê kurdi de, ku ji navê xwerû (sade) û binyata

eger nav "birazî" be, çawan "ê" ya "zê" yê, bûye "i"? Rêzaneke denganî (fonetiki) di zimanê kurdi de heye heger peyvek, bi tîpeke ji van tîpêng dengdêr (ê, i, ü) kuta bibe û tîpeke dengdêr a din li pey hat, hingê: Tîpa navbir "y" dikeve navbera her du dengdêran. Tîpa "ê" û tîpa "i", dibin "i". Wekî; rî, riya min; dê, diya min, sî; siya min; partî, partiya min. Tîpa "û" dibe "u". Wekî; rû, ruwê min.

lêkeran, di demênuho û paşê û raweya fermanî de, pêk tê.

Nimûne: Ji navê "deng" û lêkerê "gotin" ê. Binyata lêkerê bi vî awayî tête nasîn: Emê lêkerê di dema nuho de veguhêzin; "ez dibêjîm". Emê berlêkerê nuhabêj "di" û paşkoka (qertafa) "im" biavêjin. Hingê binyata lêkerê "bêj", tenê dimîne. Navê hevbend: deng+bêj= dengbêj. Her wisan ji, "xwîmmij". Binyata lêkerê "Ew dimîne", "di" û "e" dikevin, "mij" dimîne. Mérkuj, welatparêz û hwd.

Li ser vê rîpîvanê jî, binyata lêkerê "zan" ê, "ew dizê", dibe "zê". Dêmek, navê hevbend ji navê xwerû "bira" û binyata lêkerê "zan" ê, dê "birazî" be, ne "birazi". Lî, pîrsiyar e ku beranberî vê rîzane radiweste, ev e:

Heger nav "birazî" be, çawan "ê" ya "zê" yê, di vê gotinê (biraziya min) de bûye "i"? Rêzaneke denganî (fonetiki), di zimanê kurdi de heye, dibêje: Heger peyvek, bi tîpeke ji van tîpêng dengdêr: (ê, i, ü) kuta bibe û tîpeke dengdêr a din li pey hat, hingê:

- a) Tîpa navbir (kelijandin) "y" dikeve navbera her du dengdêran
- b) Tîpa "ê" û tîpa "i", dibin "i".

Wekî; rî, riya min; dê, diya min; sî, siya min; partî, partiya min.

- c) Tîpa "û" dibe "u".

Wekî; rû, ruwê min.

Li gorî vê rîzane jî "birazî" bûye biraziye min û biraziya min.

2) Zana Farqînî dibêje: Di farisi de jî, di şûna "za" ya kurdi de, "zade" bi kar tê, ku ew jî, ji "za" û "de" yê pêk hatiye. Bêjeya "zade", yan jî "zad", di her du zimanen (kurdi, farisi) de bi kar têt û di ferhengen her du zimanen de ji, peyvî cihê xwe girtiye. Ev bêje xwerû ye, ango sade ye, ne ku ji "za+de" hatiye û hevedudanî ye. Di farisi de jêderka vê peyvî lêkerê "zaden" e, bi wateya "zan", "zayîn" ye. Ev jêderk di kurdîya kevn de hebû. Niha hatiye jibûrkirin û gotina "zade", "zad" ji ber maye.

a) "za", di koka xwe ya resen de "zê" ye, wekî ku me di babeta "birazî" de rave kir. Heger "za" ya ku bi peyva "xwarza" re, li herêmeke Kurdistane hatibe xebitandin ji, heri dê şâsiyeke geleri be, bi devokî ewê ji "xwarzî" zi-

"Begzade", "Şêxzade"...

Di zimanê kurdi de, gelek bêje heye, û kokêwan hatine jibûrkirin. Nimûne: Lêkerê "man", di her çar raweyen dema buhêrkî (borî) de bi rîpîvanî tête veguhastin:

"Ez mam, ez mame, ez dimam, ez mabûm."

Lê di demênuho, paşê û raweya fermanî de, ev lêker ji jêderka kevn a jibûrkir "mandin" tête veguhastin:

"Ez dimînim, ezê bimînim, bimîne".

Çawan me zanibû ku ev lêker di van veguhastinê çûyi de, ji "mandin" ye, ne ji "man" ye?

Rêzaneke veguhastinê (kêşanê), di bêjeye: Ci lêkerê bi xurdepaşa (pârkîta), "and-in" dûmahî bibe, di veguheshtine de (nuho, paşê fermanî), bi "in" û kuta dibe.

Wekî: "Kişandin; ew dikişîne, niv-

b

şîjeya "zade", yan jî "zad", di kurdi û farisi de bi kar têt û di ferhengen wan de jî peyvî cihê xwe girtiye. Ev bêje xwerû ye, ne ku ji "za+de" hatiye. Di farisi de jêderka vê peyvî lêkerê "zaden" e, bi wateya "zan", "zayîn" ye. Ev jêderk di kurdîya kevn de hebû. Niha hatiye jibûrkirin û gotina "zade", "zad" ji ber maye.

sandin; ez dîniyîsim û mandin; tu dîmîni."

Xwarza:

Her wekî ku mameste Zana gotiye, peyva "xwarza", peyveke hevedudanî ye, ji "xwar+za" pêk hatiye.

Bi şeweyekî gelemperi (tevayî), ev gotina ku me der barê peyva "xwarza" de got, rast e. Lî, bi hûrbîni, em dikarin bibêjin:

a) "za", di koka xwe ya resen de "zê" ye, wekî ku me di babeta "birazî" de rave kir. Heger "za" ya ku bi peyva "xwarza" re, li herêmeke Kurdistane hatibe xebitandin ji, heri dê şâsiyeke geleri be, bi devokî ewê ji "xwarzî" zi-

viribe "xwarza". Eger na..., ka bi cizanê ev gotin saz bûne: Xwarza min, bûye xwarziya min, Xwarza+min, bûye xwarziyê min?

b) Ev peyv "xwar", rast bi wateya "xwîşk", "xweh" ê hatiye, lê bi teaxwe, wekî hemwateyên xwe, nayê xebitandin. Anglo, nayê gotin, "min xwara xwe dît", wekî ku em bibêjin "min xwîşka xwe, yan xweha xwe dît". Çema?

Ev peyv di kurdîya kevn û farisiye kevn û nû de ji "xwaher" bû. Di kurdîde, kîta "he", ji "xwaher" ê ketiye, di farisi de wekî xwe maye. Ev hawayê guherîn û sivikbûnê, di navbera zaravîn kurdi de ji, heye. Hindek, peyvîn resen, di zaravayekî de wekî xwe mane, di zaravekî dîtir de sivik bûne.

Wekî: Lêkerê kurdi ya kevn "kîdin", di soranî de wekî xwe maye, di kumancî de, bûye "kirin". Her wiha, "xwardin" û "vexwardin" di zaravî soranî de, beranberî "xwarin" û "vewarin" di zaravayê kurmanci de...

Kengê:

Li gorî şirovekirina mameste Zana, bêjeya "kengê", ji "çî" û "heng" ê pêk hatiye. Ev dahûrîn, ci dirust be û ci nt dirust be ji, heri diviya ku Zana ew têkiliya denganî (fonetiki) ku di navbera "çî" yê û "k" ya destpêka "kengê" de

berçav bikira. Anglo, ji me re bigotîka çawan, di vê hevkêşeyâ jêr de "çî" bûye "k..":

Çî + heng = Keng ??

Bêguman, ji bo zimanekî wekî zimanê kurdi, ku tu kar jê re nebûye, nîbes e ku em bibêjin di vê peyvî de "çî" bûye "k" û di wê de "j" bûye "ş", bêyi ku em çawaniya wan guherîn û bûyînan bi hûrbîni ronî bikin..!

Ji bili van têbîniyên ku me der bart her sê bêjeyan (birazi, xwarza û kengê) de berçav kirin, gotara mameste Zana Farqînî, zelal û cih girtî ye.

Mixabin, min xeleta yekem, ji gotarê nedîtiye. Hêvidar im rojekê webibinim.



20.10.1990

Li Stenbolê Rojnameya "Yeni Ülke"yê dest bi weşana xwe kir. Xwediyê vê rojnameya hefteyî ya ku bi zimanê tirkî derdiket, li ser navê şirketa IMC'ê Serhat Bucak bû. Gelek niviskarên navdar ên kurd di vê-rojnameyê de dîniyisandin. Hema hema tevaya hejmarên rojnameya Yeni Ülkeji aliye dewletê ve hatin komkirin. Li aliye din hêzên dewletê bi vê jî nesekinî dest bi kuşlina muhabirên wê jî kirin.

22.10.1986

Helbestvanê kurd à navdar Cegerxwîn, di heşte û sê saliya xwe de, li bajarê Stockholmê wefat kir. Hêjayî gotinê ye ku helbestvanê mezin Cegerxwîn, li dûr xwe gelek diwan, pirtükîn mîjûyi, çirok û lêkolînê

folklorî hiştin.

24.10.1945

Roja Neteweyen Yekbûyi.

Piştî duwemîn cenga cihanê, ji bo ku careke din mirovatî pêrgî kam-baxiyen bi vî rengî nebe, di destpêkê de di nav çend dewletên mezin de, bi navê "Rêxistîna-Neteweyen Yekbûyi" rêxistînek hate damezi-randin.

Not: Di hejmara me'ya çûyî di vê quncikê de, der barê rêza mehan de şâşiyek çebûye. Ji dêla meha dehemîn (10.) meha yazdemîn (11.) hatiye nivîsin. Em ji xwendevanî xwe lêborînê dixwazîn.

AWIR



Muzîyenê kurd Seid Yusif li-ser muzikê li Zanîngeha Boğaziçiye ji xwendekarên muzikhez re seminerek da. Bi sazkirina şaxa muzikê ya BGST (ev grîb xebatê xwe di vê zanîngehê de didomîne) roja 10'ê kewçerê di avahiya vê zanîngehê de, ev yek pêk hat. Nêzîk 30 xwendekarên bi muzikê re eleqedar besdari vê semînerê bûn.

Seid Yusif di vê semînerê de bi taybeti li ser muzika kurdi, ritm, meqam û enst-rumanen ku iro ji aliye gelê kurd, tirk, ereb û farisan ve têr bikaranîn, sekinî.

Tê zanîn ku Seid Yusif ev 25-26 sal e bi deng û biziqa xwe li Başûrê Biçûk deng daye û hêdi hêdi li Bakur ji bi saya kaseten xwe tê naskirin. Her wisa Seid Yusif di nav erekban de jî hunermendekî navdar e. Jê re dibêjin mîrê biziqê. Muzîyen Seid Yusif cara yekemîn e ku tê Tirkîyeyê û cara yekemîn e ku muzîsenekî kurd li zanîngeheke Tirkîyeyê bi kurdi semînerê dide.

Di destpêka vê semînerê de li ser daxwaza besdaran, muzîyen Seid Yusif ji roja ku dest bi muzîseniyê kiriye û heta iro, bi awayekî kurt xwe da naskirin.

Seid Yusif eeskere kir ku, ji ber nebûna dewlet û saziyên kurdan, li her çar parçeyen Kurdistanê muzik û zimanê kurdi di rewseke ne baş de ye û ew di bin tesîra muzik û zimanê gelên din de mane. Dîsa Yusif diyar kir ku li Başûrê Mezin kurd zedetir serbest in û bêhtir imkan dibînîn ji bo xebatê, li parçeyen din ji ber ku kurdi hê jî qedexe ye, hunermendê kurdan ji kêm in.

Muzîyen Yusif ji bo folklorâ kurdi diyar kir ku di vê herêmê de ya herî dewlemend e û di her parçeyekî welatê kurdan de, têrî dewletêkfolklorâ kurdi heye. Yusif hin gazinê xwe ji anîn ziman û

got: "Gelek stranê kurdi li tirkî an ji erebî têr wergerandin. Ev danûstandin normal e lê kesen ku vê yekê pêk tîmin mixabin çavkaniya xwe eeskere nakin, ev jî tiştekî ne baş e. Mesela nêzîki hezar besteyen min hene, gelek ji wan ji aliye gelek kesan ve hatine xwendin. Heta kurd jî bêdestûr gelek stranê min dixwînin û di ser de xera ji dikin. Mesela Şivan ji, Gulistan ji çend parçeyen min gotine û xera kiriye."

Yusif, li hemberî pirsa besdarekî ya bi rengê "Hûn muzika muzîyenê mina Ciwan, Şivan û hwd. çawa dibînîn?" wiha got: "Muzika ku Ciwan çedike, eleqeya wê bi muzika kurdi re tune. Lî xwe daye qebûlîrin. Di farisi, tirkî, kurdi û erebî de jî hunermend dikarin pop, rock û hwd. çebîkin, ev tiştekî normal e, muzik enterasyanol e.

Şivan bi xwe muzik çenake. Li Swêde jê re muzikê hazır dikin, ji wir dişin Şenbolê, ji bo kasetê her tiş tê amadekekin, di dawiyê de jî Şivan li ser wê muzikê, tenê dixwîne."

Li ser pirsa besdarekî, Seid Yusif der heqê muzîyen Arif Sağ de got ku ew hostayekî herî baş e û muzika wî ji bi temamî ya tirkî ye, ji hezarî yek jî ne muzika kurdi ye.

Muzîyen Yusif li gotî daxwaza besdaran li ser ritm û meqamên muzika kurdi jî sekinî û got: "Şes li ser heştan (6/8), sisê li ser heştan (3/8) û corcîna ritmîn kurdi ne û ritmîn dudu li ser çaran (2/4), çar li ser çaran (4/4) û balaban jî di muzika kurdi de gelek têr bikaranîn. Meqamên ku herî zehf têr bikaranîn ji, bayat, hîcaz, saba û ecem e."

Mirê biziqê Seid Yusif beriya ku semînerê xelas bike konsereke biçûk pêşkesh kir ji besdaran re.

AYNUR BOZKURT

ÇAVDÊRÎ

AMED TİGRİS

Masmediya tirk
dengê şerê taybet e

Dewleta tirk, li Kurdistanê û li Tirkîyeyê, bi derew û propagandeyan çawan bûyer û komelkujiyan (qetîlamân) vedîşere û bincil dike, xelkê dixapîne, yek bi yek derdi kevin holê. Wekî ku tê zanîn, dewletê çend hefta berê îí Girtîgeha Amedê komelkujiyeke bi plan û gelek mezin li dar xist. Li ber çavên cihanê dilen PKK'yî yên ku di Zindana Amedê de bûn dan ber çek, dar û japan. Ji wan dilen zindanê 10 kes di cih de kuştin. Yên birîndar ji, bi xwîn û birînê xedar, girtin û birin Zindana Entebê. Ji wan birîndar yek di rê de şehîd ket.

Serkomarê Tirkîyeyê Süleyman Demirel bi xwe wê rojê li Amedê bû. Belê, tiliya S. Demirel di vê komelkujiye de hebû. Wezîre Edaletê Şevket Kazan ji, di eynî rojê de fîriya û çû Amedê. Heta nivê şevê ev bûyerâ komelkuji ji raya giştî veşartin. Ber bi êvarê gotin ku "girtîyen PKK'yî li Zindana Diyarberkirê dest bi serhîdanê kirine û xwestine ku zindanê bişewitînîn." Hemû masmediya tirk ji yek merkezê û devekî bi van derewen bêbinî xwestin gelê kurd û raya giştîa cihanê bixapînîn, ser û mêjîyê xelkê careke din tevlîhev kirin. Piştî çend rojan li hemberî hemû hewldan û derewan, bûyer diyar û zelal bû. Careke din mérkûjê kurd serkomarê tirk Süleyman Demirel û Wezîre Edaletê yê bêdin û bêwijndan Şevket Kazan ê ku piştî Necmettin Erbakan mirovî Partiya Refahî yê duymîn e, li ser navê İslâmî û mafdarîyê dipeyiye, derewin derketin. Bi belge û dokumentan eşere bû ku dilen Zindana Amedê ne serî hildane û ne jî xwestine ku şewatê derxin. Birêveberiya zindanê xwestîye ku ew bibin titrafkar, lê dema dilan ev daxwaza wan qebûl nekirine, wê demê dest pê kirine pêş li wan dane, işkence li wan kirine û bi piş re ji, di navdereke (koridoreke) teng de, bi lêdanê ew kuştine.

Bi eeskerebûna vê komelkujiya barbar re, dewleta kontra wekî her demî, geriya ku bûyereke nû derxe ku ev barbarî di bin siya wê de bimîne û bala raya giştî bikişîne aliyeke dirî û vê komelkujiye ji gel veştere. Belê, dewletê ci kir û ci dit?

Mirîna ustاد û hunermendê xwe yê mezin Zeki Müren derxistin holê (!) Firtone û babelîska mirîna Zeki Müren Tirkîyeyê ji binî ve hejand û lerizand. "Ha axam, ha paşam... ustadim..." Bi koro dest bi girîn, zarîn, ax û waxê kirin. Ustadê wan û roj û stîrka hunerî miribû! Gelo Zeki Müren miribû an jî hatibû kuştin? Gelek kanalên televîzyonê û rojnameyan gotin û nivîsandin ku dengbêjê wan û mezin ji bêxwedîtiye mihiye. Hem jî li ber kamerayen televîzyona dewletê TRT'ê krîza dil pê girtiye û tu doktorî mudaxele nekirîye. Bi zanbûn û bi qestî Zeki Müren kuştine an hîstîne ku bimire. Çima?

Du sedemîn wê hene. Yek jê eeskerebûna komelkujiya Zindana Amedê û ya din ji, destdayîna ser pere, mal û mulkên Zeki Müren e. Ji ber ku Zeki Müren xwedîyê triliyonan bû. Wî berî mirîna xwe, wesiyeta xwe kiribû ku dema bimire 200 mîlyarı dê bide Weqfa Mehmetçik yanê artêşa tirk. Gotinekê kurdan heye: "Çov li kewê neket an kew hat li çov ket." Hem bi mirîna Zeki Müren wê komelkujiya Girtîgeha Amedê veşerin, hem jî artêşa tirk wê zû bibe xwedîyê 200 mîlyarı. Bi van pereyan wê carekê din Kurdistanê bişewitînîn û komelkujiye nû pêk bînîn.

Belê dewleta kontra, bi masmediya xwe ya kontra du hefta li ser hev bi Zeki Müren rabûn û bi Zeki Müren rûniştin. Wiha kirin ku komelkujiya Zindana Amedê di bin siya mirîna Zeki Müren de winda bû. Zeki Müren û nîro-mêk yanê homo xwestin komelkujiye ji raya giştî veşerin, binax bikin. Ji aliye din ve, bi vê rezalete jî qîma xwe nearîn û dest bi lîstikeke nû kirin. Wekî tê zanîn ji wan şehîden Zindana Amedê çendê wan ji navçeya Licê bûn. dewlet ji bo ku xelkê welatparêz ên Licê bixapîne, kîn û rika wan kêm bike, rabû lawê Hecî Hemîd Toprak Halis Toprak bi helikoptere eskerî bire Licê. Ci ye, ma xêr e, çima di vê demê de Halis Toprak digirin û dibin Licê! Halis Toprak dê ji Lîcîyê hemşehrî yên xwe re fabrikayeke kevirîn mermer çêke! Wey Xwedî! Halis Toprak li Licê, bi xwe digot: "Ev 50 sal in ku ez nehatime Licê, lê niha ez hatime ku ji hemşehrîyen xwe re fabrikayeke kevirîn mermer çêke..."

Dümahîk Rûpel 15

Li wî welatî aştīxwaz ji şerxwazan bêhtir in

Eşber Yağmurdereli ji herdu
çavên xwe mehrûm e lê
rewşenbîrekî têrgîhîştî ye.
Xwedî zanîn û kultureke kûr e
û tevî her tiştî jî, ew ji bo
mafî gelê bindest militan e,
ji bo aştiyê şervan e... Ji
temenê xwe çardeh sal di
hepsê de derbas kiriye. Efûya
dewletê qebûl nekiriye.

Hevalê me RAHMÎ BATUR
digel wî li ser jiyanâ wî û
çalakiyên wî yêni ji bo
aştiyê peyivî.

Cawa kîl tê xuyan hûn, li wî welatî di
warê rewşenbîriyê de yek ji wan
kêm kesen kûr û xwedî zanîna fireh
in. We bi wî halê xwe, çawa xwend
û xwe anî vê merheleyê?

● Siûdeka nifşa min hebû: Di destpêka
salên 60'ı de dema me dest bi xwendina
zanîngehê kir, kar û xebatê rewşenbîri
pir û xurt bûn. Dûmahîka wê nifşî iro bi
navê "nifşâ 68'an" tê bibiranîn. Û ji aliyê
din ve, ji aliyê malbata xwe ve jî ez xwe
di siûdeka bûn; hunermend û siyasetvan
malbata me gelek bûn. Hema bibe
di malbata me de her kes xwedî kitêb bû.

Rewşa malbatê ci feyde da we?

● Ev tê vê maneyê: Dema em ketin
nav cepgiriye, em xwedî fîkr û kulturekê
bûn. Ew kultura burjûva bû. Pir-hindik di
destpêka salên 60'ı de derdorê rewşenbîri
yên dînyayê ci dixwendin, li ser ci nîqaşê
dikirin, me ji ew dixwendin û mijara nî
qaşen me ji eynî bû. Cepgiriya me bi za
nîn dest pê kir, ne ku atmosfera siyasi te
sîr li me kir, an ji bi cihgirtineke "hasbel
qeder" ya di nav rîexistinê de em bûn
cepgir, her tiştî bi zanîn çebû. Yanê em
fîkrîn çîpgiriye ne ji argûmanen rîexistin
hûn bûn. Heta em gîhistine vê merha
leyê, em di nav lêkolîn, nîqaş û fîkrîn dor
fireh re derbas bûne. Ji ber vê ye ku nifşa
min iro pala xwe daye fîkr û kultureke qe
wîm. Û dema mirov têkoşîneke siyasi ji
tevî vê rewşê dike, mirov bi zanîn dime
şe, şiverê (averê) nabe...

Li gorî we di nav cepgiriya dînyayê de
cepgiriya tîrkan xwedî cihêjî çawa ye?

● Çawa ku li Tîrkiyeyê pêşveçûnen
kapitalistî ji sedsala 19'an û vir de dest pê
kiribe, bi sazî û bi şeklî têkiliyên xwe yê
derve çêkiribin, cepgiriya Tîrkiyeyê ji bi
derengî ji be, pêşveçûnen dînyayê şopan
dine. Cepgiriya dînyayê li ser ci nîqaşê bi



kira, li Tîrkiyeyê ji nîqaş li ser eynî tiştî
bû. Yanê cepgiriya Tîrkiyeyê tu car li der
veyî cepgiriya dînyayê nema, jê cûda ne
bû.

Ev rewş hem ji bo me bû siûd û hem jî
bû bêsiûdî. Ji me re bû sebebê tiraliya fi
kir. Lêkolînê li ser taybetiyê Tîrkiyeyê
li paş man, çenebûn...

Li gorî îdeolojiya cepgiriye, lazim e ku
têkiliyên herî xurt ew bi jar û bindestan re
çebîkin, lê diyar e ku nikarin weki burjû
vazî ji bi jar û bindestan re têkiliyan çebî
kin, cîma?

● Sebeb di dîroka cepgiriya Tîrkiyeyê
de ne... Li gorî taybetiyen pirsgirêkên Tîr
kiyeyê program çênekirine. Hînek xeba
tên taybeti çebûne, mîna yê Hikmet Kîvî
cîmlî û Mihri Belli. Lê ji bo afirandina si
yaset aktûl û piştigîrî û alîkariya gel, ke
da van késan têrê nekiriye...

Cepgir, tiştîn ku lazim e bikin, nakin.
Yanê ku di nay wan de rewşenbîrek hebe,
lê xwedî dernekevin, wî rewşenbîr nahesi
bînin, kengî ku sistem lê xwedî derkeve û
bibêje. "ew rewşenbîrekî cepgiran e" wê
çaxê cepgir çavê xwe vedikin... Cîma wi
sa ji xwe bêbawer in?

● Ji ber ku cepgiriya Tîrkiyeyê tu carî
li ser piyên xwe nesekiniye û rîexistinîya

xwe neafirandiye, ji xwe ne bawer e. Ji
ber vê yekê ye ji ku nîrînê wan bi nîrîna
çîna serdest qirêjî bûye... Pirî car bi nirx û
nîrînê wan dilîvin. Ji ber vê ye ku ev na
kokî derdikeve. Prensîbên xwe yêni realist
neafirandine, bi prensîb û pîvanîn dijmî
nên xwe tevdigerin.

Tevî berxwedan û têkoşîna xwe jî di
warê fîkr û ramanan de nekarîne ji çorço
veya sistêmî derkevin...

● Dîroka rewşenbîren Tîrkiyeyê kêm
û zêde, dîroka rewşenbîriya dewletparêzi
yê ye... Ku dewlet li gorî hînek pêwistiyen
xwe ber bi demokrasiye ve gav biavêye,
rewşenbîr ji bi pêş ve diçin, lê ku ber bi
paşverûtiye ve here, rewşenbîr ji paşverû
dibin:

Tîstekî din jî bala mirov dîkişîne ku ji
navâ refîn Refahî rewşenbîren xwedî za
nîna kûr û fireh derdikevin. Ev di nav cep
giriye de kêm bûye û her ku diçin ji kêm di
be, cîma?

● Rast e. Ev bi awayekî giştî girêdayî
ye bi rewş cepgiriya cîhanê ve, bi taybe
ti ji girêdayî ye bi dîroka cepgiriya Tîr
kiyeyê ve...

We demeke direj ji temenê xwe di hep
sé de derbas kiriye. Li girtîgehê jiyan ca

wa ye, wext çawa derbas dibe?

● Jiyana li girtîgehê zor e. Lê imkan û
siûda mirov heye ku jiyana girtîgehê bikar
ibe xweş û baş bike. Ev hînekî di destê
mirov de ye. Ger dema hûn hêj neketine
hepsê, we muhasebeya di nava xwe de te
mam kiribe, we cihê xwe di dîrokê de hil
bijartibe, we bi zanîn û xwestek ev rî hil
bijartibe, hemû imkanen ku hûn bikaribin
jiyana girtîgehê biguherînij di destê we
de hene. Lewre azadi di dawiyê de aştiyâ
derûnî ye.

Bi piranî yê derve wisa dizanîn ku ji
yanâ girtîgehê tim mat e, li wir ji jiyanê
tim û tim xemgîni difüre. Gelo ev nîrîn
rast e, jiyanâ girtîgehê her xemgîni ye?

● Ev nîrîneke şas e... Jiyanekî trajik e,
lê wekî ku ji derve ve tê xuyan ji trajik nîn
e. Belkî ji derve zêdetir di jiyana girtîgehê
de pêkenîn heye. Hesreta wir ji, xemgîni
ya wir ji, ken û şahiya wir ji, ji ya derve
kûrtir û xurtir e...

Çawa min bihîstiye li wir we bi fotbûlê
ji listiye û hûn di parastina kaleyê de ser
kefti bûne!..

● Ev ji ku derket? Li girtîgehê ji ber ku
"havalandırma" büçük in, kaleyên mînýa
tur çêkiribûn, jîxwe hejmara listikyanan
ji, ji dehan derbas nedibû. Carinan kursi
yek dataan nav kaleyê, ez dîcûm (cixare
ya min di devê min de) rûdiniştîm û min
kalevanî dikir... Ji ber ku kale büçük bû û
gewdeyê min jî gir bû, dema ez rûdiniştîm
cihê ku top tê re bibore, nedima, top li min
diket û bi şûn ve vedigerî. Tabî ji ber ku
ez di kaleyê de bûm listikyanan bişid li to
pê nedixistin û me zora yêni li hemberî
xwe dibir. Mesela carekê me şes gol avê
tin, ew sifir bûn. Yanê ez kalevanê heri
baş bûm!

Girtîyên PKK'yu çawa bi topê dîlistin?
(dikene, naxwaze bibêje, lê em israr dikin)

● Berpirsekî PKK'ê, dema hate hepsa
ku em lê diman, ji hevalen xwe re gotibû:
"Dema hûn bi topê dîlizîn, divê hûn teza
hûrat û qireqîrê nekin." Rojekê li girtîge
hê bêdengiya mirinê hebû! Min meraq kir
ji hevalan pîrsî:

- Ci qewimiye, ev bêdengiya ci ye, qey
yek miriye?

Bersiva min dan:

- Na, kes nemiriye, Apocî bi topê dîli
zin!

Em hînekî ji lê zêde dikin ha!

Serpêhatiyê wê yêni li ser girtîgehê, yêni
li ser jiyana girtîgehê nîn in?

● Gelek in, bi sedan, bi hezaran... Ü
tev ji li ser bûyerên pêkînîne ne, aliyen
din li gorî wê jiyanê normal bû. Hewce



nabînim van bibêjim. Îşkence, êş û jan... Li ber mirov kuştin û idamkirina hevalen mirov... Ev weki encama jiyana girtigehê tene xuyan.

Hûn li çend hepsan razane?

● Ez bijmîrim: Bursa, Samsûn, Trabzon, Amasya, Semsûr (Adiyaman), Diyarbekir, Mîrdîn, Sinop, pişt re disa Samsûn û ji wir ji careke din Bursa. Pişti ku ez du salan di girtigeha "E-Tipi" de mam, "Özel Tip" vebû, ez xistim "Özel Tip" û ez ji wir tahlîye bûm. Vê cara dawîn ji ku ez hatim girtin, di Hepsa Ümraniyeyê de razam.

Ku ez ne şas bim beriya kû hûn ji hepsê derkevin, Özal ji we re xeber şandibû, gotibû: "Efîyê bixwazin, em we derxin û hûn ji bibin Mandelâyê me", we bi ci awayî bersiva wi dabû?

● Ez bi şeweyêke ne adîl hatim mehemekirin û jixwe hemû kesen ku di dema 12'ê îlonê de hatin girtin, ne bi şeklekî adîl hatibûn mehemekirin. Pişti ku di navberê de sal derbas bûn, rewşa min balla rîxistinê sivil yên dînyayê kişand, ez ketim rojeva Parlementoya Ewrûpayê û yê AI'yê (Amnesty International). Özal beri ku here Rêxistina Hevkâri û Ewletiyê ya Ewrûpayê (AGIT) dixwest ji wan re jestekê bike. Serokê Parlementoya Ewrûpayê hatibû ziyareta min. Dixwest bi berdanâ min vê jesta xwe bike, lê ji bo vê ji, ji ber ku min ceza xwaribû, diviyabû min bi daxwaznameyekê daxwaza xwe niyaz bikira, bigota ji ber çavê min, min efû bikin... Min bersiva qasidên Özal wiha da: "Mandeleyan gel diafirinîn, ne dewlet. Ez nabim mirovekî ku dewlet wî mezin bike û li gorî menfaetê xwe bi kar bîne. Ku hûn nemû girtiyê siyasi berdin, ezê daxwaznameyekê wisa binivîsim, lê ji bo xwe tenê na..."

Li derive cudabûnen di navbera rîxistinan de tûj in, li girtigehê ji wisa bû, an hinek nermtir bû?

● Jiyana hundir cuda ye. Mirov dikare li derive xwe, rastiya nava dilê xwe veş-

re. Lî li hundir riya veşartinê tune ye. Du xet hene: Xeta teslimiyetê û xeta berxwedanê... Lazim e tu ji van her du xetan, bîdî ser yekê û te da ser kijan xetê, tu bi inşanen riya wê xetê re li hev dikî, di navbera te û wan de wê gavê têkiliyeke germ çedibe...

Hûn berdevkê komîteya aştiyê ne: Vê xebata aştiyê çawa dest pê kir, we çawa tê de cih girt?

● Di dawiya tîrmehê de ku dawiya ro-

Cepgiriya me bi zanîn dest pê kir, ne ku atmosfera siyasi tesîr li me kir, an ji bi cihgirtineke "hasbelqeder" ya di nav rîxistinêkê de em bûn çepgir, her tişt bi zanîn çebû. Yanê em fikrîn çepgiriye ne ji argûmanen rîxistinan hîn bûn.

jiya mirinê hat, Tirkîye bi carekê kete nav hewayeke din. Psikolojiya ku lobiyen şer li ser gel kiribûn serdest hinekî şikest. Ü diyar bû ku li vî welati aştiwaz ji şerxwazan gelekî zedetir in. Li ser vê yekê, em fikirin ku bi vê li dijî eniya şerxwazan lazim e ku em eniyeke aştiyê vekin û me weki şekil ji ev kampanyaya imzeyan munasib dît.

Yen şerxwaz ji dibêjin, em aştiyê dixwazin! Dibêjin em yen li dijî xwe tev biki, bila aşti çebibe!

● Erê... Ev ji aştiwaziya qirêji ye.

Çawa ku té xuyan dewlemendên mezin ji xwe didin aliyê aştiwaziyê. Hûn vê çawa dinirxînin?

● Yê wan ji li gorî wan, sebebê wan hene. Lazim e ew bi xwe sebebên xwe diyar bikin. Lî li gorî ku té fêmkirin, yê wan ji pirsgirêkên wan ên aboriyê hene. Ji ber şer bazara wan teng dibe. Li gorî min se-

beba yekemîn ev e. Ya duyemîn ji, li gorî min ew e ku naxwazin çavkaniyê aboriyê di vî şerî de berhewa bibin, dixwazin ku ji wan re bimîn. Ji bo vî ji aştiyê dixwazin. Li gorî daxuyaniyê fermî salî 10 milyar dollar li vî şerî diçe... È kû ne ji vî şerî be, wê piraniya vî pereyi wê bikeve bîrika van dewlemendan. Aştiwaziya wan ji ber vê yekê ye.

Burjûvaziyê tîrkan li ser dewletê ne serdest e, rewşa wan cûda ye. Li gorî we, ev edî hewl didine xwe ku li ser dewletê bibin serdest û gelo wê serfiraz bibin?

● Rast e. Burjûvaziyê Tirkîye cûda ye. Ne bi berhem û afirandinê xwe mezin bûye. Bi her tişte xwe, bi hebûna xwe ji ji dewletê re deyndar in. Yanê ji ber ku bi alykariya dewletê qezenc kirine, serê wan li ber dewletê tewandî ye. Nikarin dengê xwe zêde bilind bikin... Ya duyemîn li gorî min muhîmtir e. Ji ber ku burjûvazî ne bi hêza xwe mezin bûye, yanê demokrasiya xwe ne bi xwe afirandiye, di nav civakê de li gorî menfaetên xwe ji nikare helwesta xwe diyar bike. Li devê dewletê dinêre. Demokrasiya burjûvazî ji saz nekirine. Lî xuya ye demokrasiya burjûvazî beri her kesî ji wan re lazim e. Divê daxwaz bikin.

Baş e wê bikaribin serfiraz bibin? Herketa Cem Boyner li ser vê esasê derketibû...

● Serfiraz nebû... Wisa diyar e ku di vê demê de, sazkirina demokrasiya burjûvazî ji maye li ser milê gel, maye li ser milê çîna karkeran...

Li gorî we wê ev hevir hîj bikaribe çiqas av hilde? Yanê aboriya vî welati wê hetâ ku derê barê vî şerî hilgire?

● Weki ku behr cikivîbe xuya dike. Ez zen nakim ku we zedur şens û siûda wan hebe. Lî dewlet kwe bi rengeki wisa angaje kirîye ku ji xwe re riya manevrayê ji nehiştiye. Ancax bi temra derive mirov dikare wê tevli pêvajoya aştiyê bike... Wan bi xwe re li pêsiya xwe gitine.

Gawa ku ez dizanim, li gorî ku ji min re gotine, ez di sala 1945'an de li navceya. Ezzeromê ya bi navê Tortumê hatime dînyayê. Tortum bajarekî biçûk bû. Min li wir dest bi dibistana seretayî (ilkokul) kir û min ew li wir qedand. Ez di 11 saliya xwe de bi munasebeta qezayekê ji çavê xwe bûm... Pişti ku du salan em li dû tedawiyê geriyan, min li Enqereyê di dibistana koran de dest bi xwendinê kir. Min dibistana navînî (Ortaokul) li wir qedand. Min li Bursayê kolej xwend. Di sala 1964'an de ji min li Enqereyê dest bi xwendina hiqûqê kir. Pişti ku min ew der qedand, li Zarîngeha. Hacettepeyê min di warê felsefeyê de dest bi xebata doktorayê kir. Di sala 1973'yan de ez ji aliye İhsan Doğramacı ve ji



wir hatim qewirandin. Min li hêla Behra Reş dest bi ebûqatiyê kir...

Di sala 1978'an de ez li Bursayê bi îc'aya damezirandina rîxistinêke illegal û serokatîya wê hatim girtin. Ez hatim mehemekirin, pêşî cezayê idamî dan min, pişti re ew zivrandin cezayê sermedî (mueded).. Çardeh sal ez di hepsî de girtî mam.

Pişti ku ji hepsî derketim, min disa dest bi ebûqatiyê kir. Li ser axaftineke min a di xwepêşandaneke IHD'ê de disa ceza dane min, disa ez girtim, avetim hepsî. Ez li ser madoya 8'an hatibûm girtin. Ev qanûn ku hate guherîn, cezayê min ji bîst mehan dakete deh mehanî, ez derketim. Lî ji ber ku min "stûcê" xwe dubare kiriye, dixwazin înfaza cezayê berê ji bi min bidine kişandin. Vê gavê dosyaya min li Dadgeha Bilind (Yargitayê) e, ku were îltîmaleka mezine wê careke din min biavêjin hepsî û wê vê carê min 23 salen din di hepsî de bîhelin...

Sirûdeke derenghatî

Royerê Amedî, di sala 1959'an de li Amûdê hatiye dinyayê. Diwanek wî ya bi navê "Xwîna Kewan û Siwarêne Rewrewkê" di sala 1990'ı de li Şamê hatiye çapkirin.

Sirûd,
Li pey sirûdê
Qawan in
Bo asoyêñ şîni-yên deman
Sirûd,
Li pey sirûdê
Pengav in
Bo hêviyên kûlîkîn xeman
Sirûd,
Li pey sirûdê
Awaz in bo vejîna hinavêñ mirinan
Sirûd,
Li pey sirûdê
Sirûd in bo dildariya hinarakêñ rûyan

Li te
Digeriyam
Berî zanînê...
Endekoyen hêviyan
Kevirêñ bendewariyan
Bilbilêñ hovanan
Li te digeriyam
Li hêlén penaberîya pirsan
Li deverêñ zarîna bêçaran
Li cografiya dengêñ dayikan
Li te digeriyam
Di navenda hêz û bîhnêñ gulan de
Di dirêjahiya dil û rewan de
Li te digeriyam

Anahîta derdêñ civîkîn şâhiyêñ vemirî
Pesndara xewnêñ pincarêñ evînêñ resgîrî
Reng vedane, an agir vedan e
Sîtav e, an reng sîtav e
Dîroka gerê ye
Dengê evînê ye
Bêhna mirînê ye
Hişmendiya birineke vekirî ye
Dîroka mişextiya xewnê ye.

Hey lê keçê dilodînê
Min ji te hez kiriye
Bila dilê te, bi min bimîne
Hey lê keçê qonaxdûrê
Min dil heye, dil bi te dim
Lê, bibûre vê qisûrê

Were
Li ser vî dilê reviyayî, hêlinâ xwe çêke
Stran bi navêñ te yên ne yeksan
amade dibin

Were
Bi vî bayê lerizî, dengê xwe, ji kalanê
sîtavê bikşîne û navan bide tiştan

Were
Li ser vê reva berdewam niştechî bibe.
Û bi şopêñ leyylan stranê me bidrû

Were
Di vê xwexwînê de, tipêñ aramê, ji
xewnine revyayî re birêse.

Were
Me Xwedayêñ xwe, hîn ji bîr ne kirine.
Tu bi qedrê wan û tiştine din kî

Were
Em nêçirvanêñ dengen xwe ne
Em asokujêñ xewnêñ xwe ne
Were, were
Tu bi Xwedê kî were

Bi awirêñ te, yên nependi, rolêñ evînê
yên şkesti
Yeko yeko vedimirin
Hêvî-jî ber xwe ve-di dêmêñ buharêñ..
nehatin de
Dibîskivin
Asoyêñ tiştêñ negotin, bi gelawêjan re
vedibin
Kûlîkîn şevnistî, di rêveçûna xewnen
de bêhndar dibin
Were, were
Tu bi qedrê Xwedê û tiştine din kî,
Were

Ji mêt ve, te dinasim
Berî...
Êşê binasim
Te dinasim

Berî...
Lehiyê
Jiyane
Şâhiyê
Evinê binasim
Te dinasim
Berî...
Xwekujiyê binasim
Te dinasim
Berî...
Xwe binasim
Te dinasim
Were, were
Penaberêñ te
Şînên çarmedorêñ xwe, ji te re, rîdikin
Bi te, bi te tenê, hêviyên xwe gewde
dikin
Û bi dilbijî, di wan de,
Gevizandî dimînin.
Keskësor,
Bi sîtaviya dengê te,
Xwe li ser omîdêñ hîn xav radixe
Roj
Li heviya dastana çavpêketinê
Ro lê nema dide şevê
Sirûd
Bi derenghatina xwe
Xwe bi dar ve dike
Were, were
Sirûda derenghati
Bidarvekirî ye
Sirûda derenghati
Wate winda kiriye
Were, were
Ji mêt ve dinasim:
Tu ji min dûr i
Her û her,
Tu ji min dûr i
Tim û tim
Tu ji min dûr i
Lê,
Li dest min tişt nemaye
Ji bili vê banga berdewam
Were, were,
Tu bi qedrê sirûdê
Negotî kî
Were, were

Hêlin û zivistana tal

İsmail Kose di sala 1966'an de li Amûdê ji dayîk bûye; gelel helbesten wî di rojname û kovarêñ erekbi de hatine weşandin.

"Diyarî ji bo hêlin û ezmanekî sîn"

Çiqasî ez li çavêñ te digeriyam
Dema min nedîtin,
Zivistana min pir dirêj bû
Çiqasî ez li gavêñ te digeriyam
Dema min nedîtin,
Kolanen Amûdê pir dirêj dibûn.
Çiqasî ez li te digeriyam
Dema min nedîti
Helbesten min pir giriyan

Keçê.. ev barana ji ezman dibare
Tevde ji bona "hêlinek"ê
Di nava dilê min de şîn bê

Ciyayê li bakurê Amûdê dibêjin:
Latê di dilê evîndarê hêlinê de
Tim wê serhîdayî bin.
Darêñ li Deşta Olçîyan dibêjin:
Şaxen di dilê evîndarê hêlinê de
Tim wê şaxdayî bin.
Bihara welatê Cizîrê dibêje:
Şînbûna di dilê evîndarê "hêlinê"
de

Tim wê şîn bîmîne
Ta dawîya zemînê.

Keçê... Ji gulên çola Amûdê re bêj
Çima tu sozan bi cih nakî
Ger bihara dilê xwe vekim
Gul, çîçek, reyhan, sosin
Tev ji te'r şîn bûne,
Ez tev ji te re me
Tiliyên min ban keziyên te dikin
Çemê evînê nema diherike
Ev ci eş in li min kom bûne
Babîsok li min dizîvire
Gulek tenê mabû
Li qiraxa riya evîna min
Hêlin li min pirsa evînê bike
Bejna te dibêje tiliyên te qels in
Keçê... tariyê ez kuştîme
Barana zivistana sala 1996'an.
Tevde hêşirên min bûn
Ez şâ nebûm bi şâhiya dilê xwe
Darê min şax nedan di bihara
vê salê de
Laşê min çiqasî serma vexwar di
havîna vê salê de

Babîsok ên payîzî ez difetisandim
Di zivistana vê salê de
Sal tev li min bû zivistana, di vê
salê de
Ev sih sal ez danheva perîka
dikin
Ta ku min "hêlinek" ava kir.
Xwîn ji dilê min dadiwerive,
Ezê ci bêjim ev-êvar çiqasî sar e
Ez te di bîra xwe de tînim
Rojen "şerîn", rojen "tal"
Ezê bêjim "çola Amûdê"
Çima te hêşirê min nedan hev
Bêjim "gulfiroşan".

Gulên evîna min çiqasî dikin
Ey Xwedê!
Evîniyê ez dawerivandime.

Yazdeh dilop

Bînahiya min
Çavîyeke min bû reş û tarî
Hat ser çavîya din ewrekî spî
Ez tu tiştî nabînim
Du çîlkîn din
Xwe berdan xwarê
Û herikîn du bîrêñ min
Hêlin çekirin
Di kûrahiya bîrêñ min de
Ez tu dengek nabîhizim.

Du çîlkîn stûxwar
Dakettin çemêñ bêhñê
Çilkek bû Kela Amedê
Li pêsiya Dicleyê.
Çilkek bû benda avê
Li pêsiya Feratê

Ez tu bêhnekê bêhñ nakim.
Du çîlkîn dilşikestî
xwe berdan ser behra tehman

Çilkek bû derxûna şana hingiv
Çilkek derxûna kaniya hêşirêñ çav,
Ez tehman ji hev dernaxim.

Çilkekê xwe berda ser dilê min
Dilê min şewitî
Dilê min peritî
Dilê min eşîya
Rehêñ wî xitîmîn
Ez nikarim bîhñê bistînim.
Yanzdeh dilopêñ xwînê
Tevgera kela min
Dan rawestandin

Yazdeh tîren ji Zindana Amedê
Bedena min kirin bêjing
Yazdeh dilopêñ xwînê
Niqtin ji yazdeh
Gulên Azadiyê

GIRÊ DERSILE

Li Amedê
Yazdeh dilop xwîn niqutîn
Niqtîn û di mêtîyê min de
war çekirin

Çilkek girt
Çirika rehêñ xwînê
Û xwe da pêsiya gola ramânê
Çilkeke din
Xwîn rawestiya
Gol ziwa bû

Ji hêzê ket mêtîyê mir.
Nikare xweditiyê bike
Li bedena min
Ketîne qelsiyeke bêçare
Lebatêñ canê min
Nikarin xwe biparêzin

Du çîlkîn xwînê
Xwe berdan ser du çavîyan



Li navdênen çandeyî çalakiyên vê hefteyê.

LI NÇM'a Stenbolé:

20.10.1996 Yekşem

Ji NÇM'a Izmirê Şanoya Hêvî: "Sîmûrg û Ronahî", saet 14:00
Yekîtiya Maibatêñ Mezopotamyayê. Nimûneyên ji kîlera kurdî ya kevneşopî.

Konsera Koma Çiya, saet 18:30

25.10.1996 In

Ji hunerên dîlbarî filmê belgeyi, saet 18:30

26.10.1996 Şemî

Bernameya Bibîrânha Cegerxwîn, saet 15:00

LI NÇM'a Izmirê

22.10.1996 Sêşem

Programa Bibîrânha Cegerxwîn, saet 18:00
Kes û komîn besdar: Kaya Müştakhan, Koma Ağrî Zerdeşî, helbest: Dengê Bahoz

LI MED-KOM'Ê

20.10.1996 Yekşem Konser: Seid Yûsif, saet 17:00

22.10.1996 Sêşem

Ji NÇM'a Izmirê Şanoya Hêvî: "Sîmûrg û Ronahî".

26.10.1996 Şemî

"Anadille Eğitim" (Bi zimanê zikmâkî perwerdey), saet 16:30

RÜDAN

YNK hate avakîrin

Yekîtiya Nivîskarêñ Kurdistanê, di 12'ê kewçêrê de li bajarê Kölna Almanyayê hate damezirandin. Ji bo rêveberiyê jî, komîteyeke ji heft kesan pêkhatî, hate pê. Serokê PKK'ê Öcalan jî mesaj şand û bala nivîskaran kişande ser rola wan û piştgiriya xwe ji bo wan diyar kir.

Piştî xebateke dûr û dirêj, di 12'ê kewçêrê de li ser banga Komîteya Amadekar, ji her ali nivîskarêñ Kurdistanê li hev kom bûn û li Almanyayê, li bajarê Kölne dest bi Kongreya damezirandinê kirin.

Ji 60 nivîskarî zêdetir nivîskar û rewşenbîr besdarî civînê bûn. Di kongreyê de, nivîskarêñ ciwan û yên ku bi temenê xwe ciwanî li pey xwe hiştine, bûne yek û bi şahiyeke mezin, bi dilekî geş kongreya xwe vekirin.

Dilbixwîn Dara, bixêrhatina mîvanan da û hînek agahdarî li ser amadekirin û lidarxistina kongreyê dan. Piştî silav û rîzgirtina ji bo şehîdan, mafî axaftîne ji bo Serokê PKDW'ê (Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welat) Yaşar Kaya hate dayîn.

Kaya li ser pêwîsiya vê yekîtiyê bi firehî axîvi. Hînek bîranînê nemir Musa Anter anîn ziman û diyar kir û got: "Di dilê wî de hesretke wişa hebû, dixwest bi çavêñ xwe yekîtiya nivîskaran bibine, lê belê neyaran nehişt. Dîsa jî weki ku ew di nava me de be..."

Yaşar Kaya bi bir xist ku "Ji bo yek-kirina xebata nivîskarêñ kurd, ihtiyac bi damezirandina yekîtiyeke wisa heye. Heya ku em nivîskarêñ kurd xwe nekin yek, em nikarin li hemberî dijminêñ xwe jî binivîsinin, emê nikarîbin xizmete mezin bikin. Bîyekîti nabe. Pêşîyan jî gotine, di yekîtiyê de quwet heye, di yekîtiyê de azadî heye. Ji bo ku em azad bibin, divê em xwe bikin yek..."

Piştî axaftina Yaşar Kaya, ji bo bîrêvebi-rina kar û barêñ kongreyê diwanekî ji 3 kesan çêbûyî hate pêkanîn. Di diwanê de Selim Ferat, Abdullah Uzun û Dr. Kemal Mirewde-li cihê xwe girtin.

Li gorî rojevê Mamoste İbrahîm Ehmed, ku nivîskarê herî bi temen bû, weki ciwanekî rabû ser mikrofonê û bi kurmanciya jêrê (sorani) dest bi axaftina xwe kir: "Ez niha xwe di nava we de weki ciwanekî dibînim. Ev gaveke geleki piroz e, ji her tiştî bêhtir iñtiyaca gelê kurd bi yekîtiyekî heye. Em qelema xwe bikin yek, em dilê xwe bikin yek û tu caran ji kîmasîyan netirsin."

Ev yekîti hêviyeke me tîne cih. Nivîskar di civakê de cihêkî mezin digirin û roleke mezin dilizîn, em jî lazim e laiqî gelê xwe û welatê xwe bin. Em qelemîn xwe bikin yek û ji ser netirsin. Di şer de jiyan heye..."

Serokê Komisyonâ Çand û Hunerê yê PKDW'ê M.E. Pencewîni ji axaftînek li ser Yekîtiya Nivîskarêñ Kurdistanê pêkhatî kir.

Di axaftina xwe de Pencewîni diyar kir ku, hemû nivîskarêñ Kurdistanê xwe bigîhîmîn hev û bibin xwediyê vê yekîtiyê. Berpirsêñ yekîtiyê jî divê xwedî li nivîskarêñ Kurdistanê derkevin.

Ji Tirkîye yê Ragip Zarakolu hatibû dawetkirin û wî jî axaftînek pêkhatî kir. Di axaftina xwe de Zarakolu silavê Ismail Beşikçi û Ayşe Zarakolu ku ji ber bîr û baweriyêñ xwe di zîndanêñ Tirkîye de girtî ne, ji kongreyê re pêkhatî kir. Her wiha pîrozbahîyêñ Serokê Giştî yê İHD'ê Akin Birdal jî anîn ziman.

Wekî din ji nava platformê jî gelek nivîskar weki Abdurrahman Durre, A. Haydar Celasun... axaftîn û pîrozbahîyêñ xwe pêkhatî kirin.

Li aliyê din bi dehan mesaj ji gelek nivîskar, saziyên çandî û hunerî ji welat û ji deriveyî welat ji kongreyê re hatin şandin, ji van mesajan hin jê ev in:

Yekîtiya Nivîskarêñ Kurd li Ermenistanê, NCM, Enstituya Kurdi li Stockholmê, Enstituya Kurdi li Stenbolê, Rojnameya Azadiya Welat, KON-KURD, Kovara GZING, Akademîya Kurdi, Kovara Lales, Rojnameya Özgür Politika, Kerim Husamî, Cemîşid Heyderî, Zana Farqîni, Nijad Yaruk, Beyhanî Şâhîn, Ismail Göldas, Serokê PEN'a Kurdi Hüseyin Hebes, Prof. Manwîl Hesreyan, Prof. Seref Asîryan...

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî mesajeke dirêj ji bo kongreyê şand. Mesaj ji dengê Öcalan ku bi telefonê hatibû girtin hate pêkhatîkirin.

Di mesaja xwe de Öcalan, piştgiriya xwe ji bo nivîskaran diyar kir û wiha got:

"... Heya niha nivîskarêñ kurd rola xwe baş nelîstibûn, ez bawer dikim piştî vê yekîtiyê hûnê rola xwe baş bilizîn, imkan jî ji berê bêhtir hene. Eger hûn bi cesaret bixebeitin, hûnî di dema pêş de nivîsîn mezin, romanêñ mezin û her tiştî mezin-bidin gelê xwe. Wê demê hûn dikarin bibejin me jî ji bo gel tiştek kir. Emê jî, hûn ci ji me bixwazin, eger hûn dirust bixebeitin, emê heya dawiyê alîkariya we bikin... Li dawiyê ez silav û hummete xwe ji we re dişinim û serkeftinê ji we re dixwazim."

Destûra ku Komîteya Amadekar amadekirî hate xwendin û munâqşekirin. Di dawiyâ kongreyê de jî komîteyek ji 7 kesan hate hilbijartin. Û bi hêviye serkeftineke mezin dawî li kongreyê hat.

AZADIYA WELAT / KÖLN

TİSK

LERZAN JANDÎL



Azadiye û işkence

Sebeta ke welatê ma de û dinya de rojevi zaf rew vurînê, mordem hêşikîno ke angorê rojeve nivisan binivisno. La belê wunciya (tiya) jî ez wazena meselaya azadiye û işkenceye (şasetû) ser ro bivinderf.

Çinay re yan jî qeyî azadiye û işkence? Davîste roje naye ra ver mi yew vengûvac heşna. Angorê nê vengûvacî kesanî filistîniyê ke ênê guretene hetê polisî filistîni ra işkence vînenê. Yanê polisî filistîni ere şarî xo işkence keno.

Ma şarî filistîni kam o? Béguman şarî filistîni, şaro ke ebi seran hemverê İsrailî ser kerdo û keno, wo. Şarî filistîni seba azadiye, seba haştiye (aşitiye), seba xosertiye, seba bîr û bawariya xo hemverê koledaran, hemverê işkence, zulm û zordariye ser kerd. Her çığa ke ewro wayirê welatêde xoseri niyo jî, zê verî tam binê koledariye de jî niyo. Angorê xo tenê heqê xo guretê xo dest, otonomî bo jî wayirê institusyonanê şarî yo. Nê institusyonan ra yew jî monopolî şîdet û qiweta çekî ya, yanê polisî.

Kesê ke ewro polis ê, ebi qançurê (bac) şarî filistîni ênê weyî kerdene. Wunciya nê polisan jî seba azadiye, seba haştiye, seba xosertiye, hemverê koledaran, hemverê işkence feba şarî xo ser kerd. Yanê nê jî şervanê azadi û haştiye bî. Kam zano, belkî serê yan jî di serî naye ra ver nîna yanê qurban û polisî piya tê kaleke de hemverê koledaran ser kerd. Yan jî piya işkence, zulm û zordariye diya, piya zere de mendê.

Ma qey se bî ke, nê şervanê azadiye ra polisî ke işkence kenê vejiyyayı?

Ez bawer kena, ebi yew nivîsî cewabê na perse dayene gelê zamet o. Çimke sebebe na yewe ne teyna politikaya dewleta filistîni ya otonomî ya, ne jî şert û şartê, ke şarî filistîni tede rê, wê.

Nâ taye jî şessiyet û kesitiya nê kesan ra girêdaye wa. Ez na derheq de balê wendoxî onçena karê sosyol psikolog Stanley Milgramî. Angorê bawerîya mi Milgramî na derheq de xêlê çiyî kerdê zelal. Çiyo ke zelal niyo, o wo, ke ma şarî ke seba azadi û haştiye ser kenê domananê xo angorê na zanayenê perwerde nêkenîme, yan jî nêwazenîme perwerde bikerîme.

Verde şarî filistîni, çimke na problema dînan ésta, bado jî şarî bindestî yê bînî, gañî bingê kesitiyanê ke işkence kenê, wete ra wedarê. Seba naye jî hemverê kesitiyanê cérêna şerî bikerê, domananê xo angore perwerde bikerê.

Verê kesan yan jî kesitiyanê otoritan vîle ronayene.

Hemverê şenikîyan wayirê verhukman biyene, wayirê toleransî nêbiyene.

Zaf zêde girêdayiye normanê grupe biyene.

Wete ra wedardayena yan jî perwerdekerdena çiyanê "hemverê moralî" de zaf ekstremlî biyene.

Wetê eleqayanê mordeman de tendensî bêşexsiyetiye musnayene.

Eke niya nêbo, zê meselaya newiye, nameyê filistîni û nameyê türkiye hetê Al (Amnesty International) ra piya êno vatene. Gani işkencelerden seba yewî ra yanê Tirkîye ra edet biyene, la belê seba filistîni tomete biyene. Ci şerm o, ke ewro işkencelerden seba hurdmîne biyâ edet.

Di taya germ de

**Ma ne şerm e ku piraniya we dibin hevalbendê
Roma Reş di vî karê kirêt de? Çend televizyonên we hene?
Çendên tirko bi xwe hene? Hûn çawa wek mirovan
dikarin li rûyê hev binêrin?**

Min bersinga xwe tiji kevir kiriye, çavê min sor bûne, kef û kinc bi devê min ketiye, wek lokê devihê, gava hiç dibe, li min hatiye.

Cawa ez har nebim û ev zilm, ev bêbextî, ev xwe-xapandin û ev derewên eşkere ku bêserm û bêfedî tên belavkîrin.

Ci bi vê dinyayê hatiye? Min çiqas çavê xwe gerandin, pirtir ji kevirên Qudsê, ku niha serhildana diduyan lê dest pê kiriye, nedîtin, ku ez têrî xwe bidim hev. Min êrişa xwe ya pêşî berda ser çend kesenê nêzîkî xwe, ji bira û kurapan. Hinek ji wan ta bi guhêñ xwe, di nav xwe-xapandinê de teqinî bûn.

Her tiş bi destê Amerikayê ye û wê kiriye ku bi serê xwe dewleteke kurdî çêbîke. Bush, bêyi ku here hecê, bû heci, Clinton di rê de ye ku bibe pêxember û Şalyarê (wezîrê) Amerikayê ye Derve Christopher, jixwe kevoka aştiyê ye.

Erê çima dixwaze li başûrê Kurdistanê dewletekê çêbikê û li Bakur, teknolojiya herî modern û pêşketî dide tirko? Ma ew jî ne kurd in?

Berî ku ez keviran biavêjim wan, wan guh-dabû peyva berdevkê Wezareta Derve ya Amerikayê, ku gotibû: "Em-dê parastina xwe ya şer li ser bakurê Iraqê rakin."

Jixwe ev pênc sal in ku optimistên (xweşbinê) me li bendê bûn, ku xeta parastinê ji 36'an bînin 35'an. Pêxemberê di rê de ji xwar ve ji 32'yan anî 33'yan. Diyar e çavê Kuveytê û yên siûdiyan ji yên me hê reştir in.

Mirovên min, ji min baştıri dizanın ku ev eyîn ew kar e, yê ku Kissinger di sala 1975'an de pê rabûbû.

Kûrbûna birîna pişte hê ne xuya ye. Hêvî ew iñ ku ne kûrtir be ji ya sala 1975'an.

Piştî Kissinger, Christopher ji here û Milyaketo were, ew dê her xwediyê ve bîr û baweriye bimînîn.

Civîna Şalyarê Derve yê Ewrûpiyan, li Luksemburgê hatibû hev.

Min ji pêş hemû hevalên wî ve, bi pêşira John Major girt û hejand: "Xwediyê kevntirin parlamentoye li dinyayê, parêzêrê mafen mirovan, rîzdarê gotina rast a bîr û baweriye! Ma vê carê "Zeyneba Zer" ci ji te re anîbû?"

Hê min singa wî bernedayî min çavê xwe li Şalyarê Derve yê Belçikayê gerand. Ew ji bin xwe sil bû. Bêpêjîn dixwest ji wir bireve.

Hey bêbext, ma te ji kurdan pê ve kes nedît ku tu bibêjî "Ticaret namûsê dikin, jinan difiroşin". Lawo em cil milion in, cil milion. Eger her yek ji me rojê yek markî bide, dike cil milion, hey sêwî kurê sêwîyan. Erê rast e hê ji,

ji tevgerên me kurdan bi xwe hene, ku bîr li vê nekirine û ji vê hêza xurt qezenc nedîtin, lê hûn bi hemu zîreki û fîrbaziya xwe ma rast e hûn nizanîn pereyên me ji ku têrî?

Eger bi pereyan tenê bûya, me dikarî deh Med-TV'yan peyda bikira.

Min bi bestika Şalyarê Derve yê Belçika girt û serê wî gîhand ber ê John Major. Ez li yê mayî fetilîm û min got:

— Ma ne şerm e ku piraniya we dibin hevalbendê Roma Reş di vî karê kirêt de? Çend televizyonên we hene? Çendên tirko bi xwe hene? Hûn çawa wek mirovan dikarin li rûyê hev û din binêrin? Balona we, ya ku hûn bi gotinîn qelew wek demokrasi, mafen mirovan û azadiya ramanan, her roj pifê didin, ha wext e biteqe. Bi rastî Med-TV, ya ku dê bîhêle dengê bombeyeke ji teqandina vê balonê were. Bêkemâsi rasitiya we ji gelê me re dê diyar bike.

Jixwe, ji ber vê yekê ye ku hûn her gav û dem dixwazin devê wê bigirin. Devê wê ji, devê cil milyon kes e. Lê ev dev êdi nema tê girtin.

Ev zimanê ku ta niha hemû şanikên wî nixumandibûn, roj bi roj, zingara xwe diavêje û dest pê kiriye riyan nû vedike û bi dehan inîsiyatîfîn cuda cuda peyda dike. Bi ser me de bes werin, nehêlin kér bigihêje hestî. Heta ji me tê em penga li ber kombuna hestên xwe radigirin. Nehêlin pêl xurttir bibin û ev peng biteqe.

Şepa ku hingê rabe, kes dê nikaribe li pêşberî wê raweste.

Bi vê hêrsê ez ji hundir derketim û min berê xwe da redaksiyona kovara "X"ê.

Min datayê (komputer) wê dan ber keviran. Çend kesen ku li wir hebûn çavê wan man ziq û bi kursiyen xwe ve man girêdayî. Wan ez nas kirim. Hin bi hin ew ji dilehiya xwe derketin.

Berpîrsê wê bi ser min de hat û got: "Ci bi te hatiye? Tu dîn bûyî?"

"Na, ez ne dîn im û ne jî şas im. Ez nema dikarîm vê bêinsafiya we daqurînim. Roj nîn e ku bi dehan bûyer li welatê te naqewimin.

Li vê Ewrupayê ji. Dev ji şerê ku di her quncikê welêt de tê ajotin (ku bi hezaran gund tên valakirin û şewitandin, bi milyonan kes tên koçberkirin, bi hezaran kes dikevin birçibûnê li seranserê zîndanîn dijimin de) berde. Dev ji van tevan berde. Li vê derê, li pêş çavê te diqewimin, (na bibûre, tu qet naçî wan deveran) tu, xwepêşandanîn bi deh hezaran kes di televizyonên almanî, itali û frensî de, dibîni.

Tu li festivalen ku bi sed hezaran kes tê de dicivin temâse dikî (tevî ku ji sedî sed tu di wan de ji qet cih nagirî)..... lê ne hum û ne gum.



Ji devavêtinê re, qebqeba te ye. Ciama di warê din de ziman di devê te de dibe gulok? Ez dikarîm çavan li vê bêdengiya te bigirim, lê ev bêdengî, ev bêhîş û kirêni ya beramberi girtin a Med-TV'ye, di gewriya min de naçe xwarê.

Hey malwêran, mä kurdek dikare vê daqurtîne?

Tê bîra te sersala 1990'î, katê min serek li te da? Hemû kemalên televizyonên tîrkan; hemû rojname û kovarê wan (ger bi rovîfî û gemarî be ji) li ser bi sedan bûyer û serhildanîn welêt diweşandin û dinivîsandin. Wê katê, li mala te çend hejmar ji rojnameya "Tevger" ê li ser maseyê li pêşîya te bûn. Min çend rîsnel ji wan vekirin..... ne his, ne kir. Hingê ji heş rîexistinê bakurê welêt xwe kiribûn yek û navê "Tevgerê" li xwe kiribûn. Di hemû hejmaran de li ser başîrê welêt (ku tu ji dizanî wê demê çiqas kerbûn û bêdengî li wir hebû) hatibû nîvisandin.

Dîsa ez ne li dij im ku li ser başûrê welêt ji were nîvisandin. Lê, wê demê ji min ji te re got: "Ki xwedan wijdan, dê ji we bawer bike ku hûn bi doza xwe re rast û ciddî ne! Hest rîexistin ji bakurê welêt in, ku ne bi başî, yan ji bi xerabî li ser parçeyê xwe bi xwe, nanîvisin".

Paş nêzîkî heft salan hê ew dîtin û hê ew lebt!

Eger tu di gundekî Jîrkan, gundekî li dora Çiyayê Meleto, li tenîsta çiyakî ji çiyayen nêzîk Varto yan ji Serdeşte bûyayı, min dê bigota, ev hê ji zingara Mehmutkî û Etmankiyê, Hevîrkî û Dekşûriyê ye. Lê tu di nava nîvê pêşketîtirin teknolojiya ku li ser rûyê cihanê de yî. Tu wê ji bi kar timî. Ew ji her tîbi zelalî li ber te radixe. Dimîne êdi

ku tu destê xwe deynî li ser dil û wijdanê xwe."

Kevirê, ku min li bersinga xwe kom kiribûn, hin bi hin kêm dibûn.

Bi lezelez min berê xwe de studyoya Med-TV'ye. Min çavê xwe li Rotînda û li ... gerand, min her du di jûrekî de zeft kirin. Li dûv hev, min li her yekî ji wan kevirek li hestiyê paqê, ku bi gunûkî jê re dibêjin hestiyê tirê, xist. Qarînî bi wan ket:

— Ev ji da ku hûn careke din programmîn xwe nîvco nekin û nebêjin: Mêvanê me kurdi nîzane em dê bi tirkî pê re baxiwin.

Bi qarîna Rotînda re ez ji xew hilçenîm.

Niha pişti ez ji xew hisyar bûm, hînek poşmanî beramber çend kesan bi min re çêbû. Ez dizanim, ku bira û kûrapen min, dê li min biborin.

Ez qet lêborîne ji John Major û hevalen wî naxwazim.

Ez berê xwe didim hevalen redaksiyona kovara "X"ê û dibêjim:

— Li min negirin. Ci tişte bi zimanê me bê nîvisandin pêwistî pê heye. Nemaze ew tişten ku li ser dîrok, ziman, çand, huner û hwd. tên nîvisandin. Lê gelo di vê dema germ de, di van tensasiyên ku gelê me tê re derbas dibe de, ne girîng e, yan ji ne girîngtir e ku pire caran li ser es, zîlm û nexweşiyen vî gelî bê nîvisandin?

Ta kengê ev dûrbûna me ji hev û din? Bi hemû hêz, hisyarî û rastiya xwe, ez destê xwe ji te re dirêj dikim.

Ka tu ji destê xwe bide min.

Ü niha serhildana diduyan lê dest pê kiriye, nedîtin, ku ez têrî xwe bidim hev. Min êrişa xwe ya pêşî berda ser send.

DR. HEZNÎ HACO

SIYAR

Sazbendo



SIYAR / Sazbendo

ZILAN / İro



Rayedarên tirk pirsgirêka kurdî napejirînin

CELALETTİN YÖYLER



Pir şerm û pir fedî ye ku mirov ji tişten heyî re bibêjin tune ye. Hem jî ji tişten tuneyî re jî bibêjin heye. Van gotinêni wiha dibêjin ji Pergala Cihanê ya Nû û zanyariya musbet re. Hem jî ji zanista Qurana Xwedê re, lewre hemâ kesen li cihanê dibînin û dizanîn ku neteweyek li Rojhilata Navîn bi hindiki pênc hezar salî berî zayînê, heta iro li ser vê axê dijî.

Navê wî neteweyî jî di dirêjahiya dîrokê de heta iro, geh cardon, geh Nayrî, geh Mîtanî, geh Xaldî, geh Hûrî, geh Orarî, geh Medi û niha jî kurd e. Ev gel ji dema Nûh Pêxember heta iro li ser axa Mezopotamyayê jiyaye û hê jî dijî. Ew axa welatê wî yê dîrokî ye. Hem jî binîcîh û xwedanê wê axê ye, ne koçer e.

Ev gel xwediye çand û dîrokeke kevnare ye. Lî iro perîşan û bêinxên neteweyî hatîye hiştin. Pir mixabin bi ser de jî Serkomarê tirk li Italyayê, serokwezîr jî li Libya dema ku nikarin bi rastî û dirustî bersîva rayedarê van komaran bidin, bi çewti û nerastî dibêjin:

Tu pirsgirêka kurdan li welatê me tune ye. Ev bersîva han a çewt û nerast, du wateyêne wê hene; yek, ev e ku gelê kurd li Tirkîyeyê wekî tirkan xwediye her pişê û parî ne, ew jî jixwe her ne wisan e. Ya diduyan; wateyêne ew e ku her du rayedar dibêjin, tu pirsgirêka kurd tune ye, arigo ev komar a tirkan bi tenê ye ji ber ku jê re dibêjin komara tirk, yek gel heye. Jixwe ev jî ne rast e, lewre li vî welaş pir gel heye. Ji bilî wan jî du sê neteweyen. Yek jî van gelê kurd e. Lewre ew arî ye, ne turanî ye. A bi van ramanan ew bi nîjadperestî li Tirkîyeyê her kesî tirk dihesibînin.

Ev hemû teoriye nîjadperestî û bêdadî, dijminaşî û çewti ne ji rastiya gelan û maşen wan re. Hem jî ji binî ve dijjdarî ye ji bo zanyariya civakî. Lewre kurd hene, ew tene perçigandin, kuştin û zêrandin. Ev pirsgirêk hem heye, hem jî pirsgirêkeke mezin, gîring û navneteweyî ye. Heger ne wisa be û ne rast be li ser gotina zordarê dagirkeran li her çar

parçeyêne welatê me, lê çima me dikujin, malen me talan dîkin, wêtan dîkin û dişewitînin?

Em kurd hene. Em ne meçêtir (cin), ne jî şeytan in. Em mirovinê xwenas in. Hem jî em dixwazin bi tirkan re, bi ereban re, bi farisan re bêcudatî wekî bira bi hev re, wekî hev bêsnor û parvekirina axê bijîn. Lî çawa min got-wisa bijîn. Lewre em jî wekî wan her sê nijadîn ku me dikujin, mirov in. Xwedê em jî wekî wan bi çav, dev, ling, dest û hiş afirandine. Em çawa di afirandina bedenan de wekî hev in, wisa jî divê ku em di xebîtandina mafan de jî wekî hev bin.

Ne hûn dirûşmân nîjadperestiyê biavêjin û bibêjin, "tirkek hêjayî cihanê ye", ne jî em bibêjin em pâk û paqîj arî ne. Belê ev dîtina mirovahîye ye, ne ew e ku hûn bibêjin pirsgirêka kurdan tune ye û gelê kurd bi şışan di zîndanan de bikujin. Bes e ev şâş, bes el. Werin ser riya rastiyê û biratiya gelan, werin ser riya rawestandina tevkijiya ciwanen kurd û tirk. Bila êdi dayîk negîrin li ser ciwanen xwe. Ev e riya mirovahîye û dadmendiyê. Bişî mirovahî û têkoşîna ji bo parastina maşen gelan, bimre nîjadperestîya çepel û êrişen li ser dilen li zîndanan.

Ji cîhana muzîka kurdî du berhemên nû: ‘Sazbendo’ û ‘İro’

“Koçer Production”
du xebatêni ji hev cihê
pêşkêşî hezkiriyê muzîka
kurdî kirine. Yek jê bi navê
“Sazbendo” ye
ku ew ya hunermendê navdar
Şiyar e. Xebat li ser qayde
Û usûlên berê hatiye
amadekirin. “İro” jî ya huner-
mend Zilan e û li derveyî
vê yekê ye. Ew ketiye
ser “riya nûkirinê”
ya muzîka kurdî.

yazdeh stran hene. Stranen gelêri ku wekî potporî hatine strîn ev in: *Here Malê, Lo Delala Dilan, Lê Leylê û Ya-
ra Te Me Ez*. Ji 11 stranen şes tene jê
yên Şiyar in, yanê gotin û awaz ên wi
bi xwe ne. Ev jî ev in:

*Sazbendo, Van Delalan, Sîrîn (Bê-
welat im), Weylê Dayê, Ez Rêwi me û
Ez bêwelat im.*

Her pêncenî mayî jî, dudo jê gelêri
ne (*Were Vira û Yadê*) û sisîyên din
“Dérsim” û Mihemed Şêxo, “Kalo” ya
Şeroyê Biro û (“Cizir e Cizir e” jî ya S.
Hemo ye).

Şiyar di vê berhemê xwe de awayê
xwe yê strînê neguhartîye û parçeyen
xwe li gorî teşe, meqam û ritmîn kurdî
çekirine. Naveroka wan li ser evîna
welat û şerê azadiyê ne.

Parçe bi gelemperi ji ritmîn sivik in
û dîkin ku guhîdar li berê rabin goven-
dê; digel ku du serhewayen xweşik
(kalo û Yadê) jî tê de hene.

Di vê xebata bi navê “Sazbendo” de
amûren (enstrümanten) wekî mey, zir-
ne, bilûr, def, kemançeya klasik, ûd,
qanûn hatine bikaramîn. Produktore kasetê
Koçer e û derhêneren wê jî Şiyar û
Kadir Şeker in.

“İro” jî navê xebata Zilan e. Di vê
xebatê de yazdeh stranen cih girtine. Di
beşa A’ye de:

*Serhîdan, Şikrayê, İro, Em Azadî
Dixwazin, Dinyayê û Hatin.*

Di beşa B’ye de:

*Wayê, Gula Azadî, Wî Dayê, Canê
û Newroz Hat.*

Jî bilî “Wî Dayê” ku ew bi zaravayê

kirdî/zazakî ye, hemû stran bi kur-
mancî ne. Digel vê yekê, nehatîye xu-
yakirin ku kijan stran aidê kijan huner-
mendî ye. Di xebata Zilanê de stranen
ku ji guhîdarîn muzîka kurdî re ne bi-
yan in jî gelek in. Mîna Şikrayê, Canê,
Wî Dayê, Dinyayê û hatîn.

Di vê berhemê de Zilanê bi giştî
meyla xwe daye ser ritmîn gîran û ki-
riye ku muzîkhez li xebatê guhîdar bi-
kin. Lewma jî zêde cih nedaye amûren
wekî zirne, saz û meyê. Ku bi awayekî
din bê gotin, Zilan bi awayekî wisâ
striye ku ne xencereya kurdî bi kar ani-
ye û ne jî bi qayde û usûlîn muzîka
kurdî ya kevnare ve girêdahî maye.

Amûren ku bi sedan sâl in di muzî-
ka kurdî de hatine bikaranîn di vê ber-
hemê de li paş dengê klaviye û kompi-
turê mane. Stranen ku dengen amûren
wekî zirne û saz li pêş in jî hene, wekî
“Şikrayê”.

Mirov dikare bibêje ku “İro” xebate-
ke azmûnerî (telesiyî, sinetiyyî, tecrûbî)
ye û tê de şêwe, ritm û qaydeyên muzî-
ka biyan jî hene. Naveroka stranen li
ser têkoşîn û evînê ne.

Produktore kasetê Koçer û der-
hênerê wê jî Hüseyin Aydin e.

Wekî gotina dawî, “Koçer Produc-
tion” du xebatêni ji hev cihê pêşkêşî
hezkiriyê muzîka kurdî kirine.

Xebata bi navê “Sazbendo” li ser
qayde û usûlîn berê hatiye
amadekirin. “İro” jî li derveyî vê yekê
ye. Ew ketiye ser “riya nûkirinê” ya
muzîka kurdî.

ZANA FARQÎNÎ



Hesar, Hesenkêf, Mezopotamya û Cegerxwîn

Destpêk rûpel 16

Xwendina geh li vir û geh li dera han, geh li ber desten vî alimî yan jî alimê din û xwarin, vexwarin û razana geh li vê malê û geh li mala din geh li hucra vê camiyê û geh li hucra camiya din li ser malbatê, xizmayetiye û pir tişten din, li ba Cegerxwîn mefhûm û ditinê cihê û nû çedike û di temenekî xort û berî 25'an de seyda dikeve pêsiya emrê xwe; bîbir, firehbin û kûrbîn dibe. Jiyan û debara bi vî awayî, bêcîh û bêwarî, yan jî rastiya ku her mala Kurdistanê mala seyda ye, li her der û her cihê Kurdistanê dikare bixwe û vexwe, raze û bijî, seyda bêqedar kurdistanî, neteweyî û welatparêz dike. Ne dê û bavê wî, xwişk û birayê wî belê Kurdistanê û gelê kurd ew bi xwedî kirine, mezin kirine û kirine xwedî ilm û pêzanîn. Kesek hebe spasdariya wan bike, cîhek hebe jê bişkirine ew jî gelê wî û welatî wî Kurdistan e.

Salên Kurdistan parçê dibe, sînor di ser sîngâ Kurdistanê re derbas dabin seyda hê

xwendevan e, geh li vir û geh li dera han e. Bi giştî seyda êdi mirovekî hişyar e. Dibîne ci tê serê kurdan. Hêdî hêdî bi kirêtî û mirittiya bindestiyê dihese. Zilma dagirker û serdestan dibîne. Parçebûnê, netica parçebûnê çawa di-be, dibîne. Çawa gund û bajar dabin dudo, serxet û binxet çawa çedibin, çawa kurd li welatê xwe qaçax û firar dabin, gişan dibîne. Ev giş seyda dipojînin, dixin nav mitalan. Seyda li ser vê rewse berî pir kesan di emreki ne mezin de difikire, serî û mejîye xwe diwestîne û helbesten xwe yên ewil di sala 1923'an û 24'an de dihone.

Seyda heta niha mîna çûk û bilbileki azad bû, cihê dilê wî dixwest, dara wî dieciband li ser datanî. Digeriya û şîrsîra wî bû. Sînorê nav Kurdistanê ew xistin qesef û rekehê û êdi Kurdistan ji destan çûbû, mabû li ser talan û çûrê, nehib û wêrankirinê.

Kurdistan ji destan cûye, ax axa seyda ye. Ji dil û ji kezebeh dinale, hêrs û kelegirê dibe û helbesten mîna "Pemboyê me ye, belê em tazî ne" û "Ka Kurdishana min ka" dinivîsîne.

Di hundirê seyda de pelen qehr û tolhildanê li hev diqulipin. Di hundirê xwe de hew hiltê, erd û ezman wî têhemûl nahe. Mîna ku di eyarê berêz de be, kabûsek li ser sîngâ wî rûniştibe, di qeyd û merbeten hesinî û polayı de be, mîn ku tu wî di nava demûşê de bidî û bavêjî nav moristanê gêrikan û bi hezaran gêrik li ser laşê wî derkevin, cirid û tradê û ji hawîrdor wî bidin ber gazan, mîna tu wî bavêjî binê zîndaneke bêbînî, reş û tarî û xwarina wî kerafi û vexwarina wî zîlîndar be....

Ne şev lê şev e, ne jî roj lê roj e. Gelek bi kurtî feqe Şêxmûs êdi bûye Cegerxwîn û xemgîn û xemxwarê welatê xwe. Ya xerab kes li meydânê ne xuya ye, kesekî ji vî welati re xweditiyeke baş, xweditiyeke ji dil û can, bi hêz û şarezayî bike û karibe qetabê xwe li yên neyaran bide, berê xwe bide zâlim û zordaran, ne diyâr e. Ne beg serê xwe bi rewse re diêşinin, ne jî alimên dîmî û ne jî dewlemend û xwedî milk û xanedan.

Rewşenbir!!! Dev ji wan berde, ew bi gotinê Cegerxwîn "bi biskîn şê dakteine û ne di nav paxav û mitala welat de ne". Şêxmûs dibe Cegerxwîn, kezebeh wî xwin digirin.....

Seydayê Cegerxwîn bi dirêjahiya temenê xwe, ji roja ku hişyar dibe, xwe nas dike û bi vir de, heta roja serê xwe datîne û ji nav gelê xwe koça dawî dike, bi dilxwazî û evîneke mezin, bi giş hêz û karîna xwe li ser gel û welatê xwe nîvîsî û ji bo gel û welatê xwe qêriya, kire hawar û gazi. Bêwestan got û bêsekin biland.

Di piraniya helbest, nîvîsandîn û lêkolinê Seyda de kurd û Kurdistan, azadî û serxwêbûn, nefret û rîka ji bo bindestiyê, raperin û şerhildan dabaşen serekî ne û cewherê herî berçav in.

Em bi çend rêzan ji helbesteke Cegerxwîn ku ji bo kurê xwe Keyo gotine, tişte me xwest bibêjin biqedînin: "Li dunyayê temâze ke kûrê min/ Tu dé paşê binası, xweş bibenî"

Tu daxwaza dilê min qet nîzanî/ Heta perde ji ber xwe hilneyêni.

Heimû kes dilbijokê kers û toz e/ Nikare gewherê paqîj derêni.

Mirovîn zana û hêja li cem me/ Wekî cewher di sergo de hilêni.

Gelek jar û perişan û belengaz/ Heta dimî, tenê navek dimîni

Cegerxwîn destê rastî girt û keşa/ Daxwa-zî ko ji piş perdê derêni."

WELAT

Rojnameya Hefsteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basım ve
Yayincılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

NAVNIŞAN
Ayhan İşık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMİ TAN
RAHMI BATUR

Berpîrse Karê
Nîvîsaran
(Yaz İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrse Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHIR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.S.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliğimiz)

Nîmînendeyê Giştî
yê Ewrîpayê:
Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost
Helim Yûsiv
963-21-960099

Berlin:
Sîleman Sido
49-30-69002695

Hannover:
Selîm Biçûk
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

BrukSEL:
Medenî Ferho
32-02-466037
Stockholm:
Robîn Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Masmediya tirk dengê şerê taybet e

Destpêk rûpel 7

Halis Toprak, tu bav û malbata xwe heta niha li ku bûn? Cîma rewşa hemşehriyê te, niha hat bîra te lo? Di sala 1975'an de, dema li Licê erd hejiya yanê zelzele çêbû û Lice ji binîve xerab bû, kevir li ser kevir nema, 5 hezar ji hemşehriyê te mirin, bi hezaran bêmal û bêxanî man, perişan û sêwî man, wê demê tu û malbata te li ku bûn? Ji sala 1993'an ve, ev sê car in ku ew helikoptera ku niha tu pê çuyî Licê, bi jor ve û bi jér ve jî bi top û tifing artêşa tirk li Licê girê dan û şewitandin, wêran kir. Heta niha bi sedan Liciyên hemşehriyê te şehîd ketin, te cîma rojekê li hal û rewşa wan nepîrsi?

Bavê te Heçî Hemîd liciyî şelandin, rût û zilüt kirin, ew girtin û birin Edenevîyê û bi ked û xwêdana wan li wir Güney Sanayii ava kir. Rojekê negot "Ez licî me." Tu di 50 saliya xwe de cara pêsi têyi Licê, ma xêr e? Licî û hemû kurdistanîyê welatparêz te û dewleta te baş nas dikin, armanca hatina te jî baş dizanin ku ci ye. Tu here 20 triliyon bide, jina xwe berdet!

Dewlet dixwaze bi Halis Toprak welat-

parêzén herêma Licê bixapîne û li herêmê cehşîtiyê bi hînek kes û derdoran bide qebûlkirin. Ewê ji liciyan re fabrika çedike û kar dibîne ku licî zikê xwe têr bikin û kinc li xwe bikin? Xelkê Licê hişyar e ji zû de, biyara xwe ya dîrokî daye. Cara yekê di sala 1925'an de li Pîranê û cara diduyan di sala 1978'an de li Fîsê bîryara xwe daye û ji wê rojê û vir de bîryara xwe di jiyana xwe ya pratîk de bi cih tînin. Licî bi qerar û peyhan in.

Pîrsa kurd ne pîrseke herêmî ye, ne pîrseke fabrikayeke ava firingîyan (ava balcanênsor) an jî kevirên mermer e. Pîrseke neteweyî ye, pîrseke pîroz û mezin e. Licî caş û xwefîrsen wekî Halis Toprak Hikmet Çetin tu caran efû nakin. Dûr an nêzîk dê rojekê hesab ji wan caşen xwefîroş bipîrsin. Helbet ev yek ji wan tîrşikxwarênu ku li peyî wan çepik lê didin re jî namîne!

Êdi senaryoyen dewlet û hikûmeta kontra cih û bingeh nagirin û zûtîrin pûc derdikevin. Komelkujiya Zîndana Amedê carekê din baş da diyarkirin ku masmediya tirk bi giştî çawan di xizmeta dewleta kontra û şerê taybeti de ye.

hesar, Hesenkêf, Mezopotamya û CEGERXWÎN

Feqe Şêxmûs êdî bûye
Cegerxwîn û xemgîn û
xemxwarê welatê xwe. Ya
xerab kes li meydanê ne
xuya ye, kesekî ku ji vî welatî
re xwedîtiyeke baş bike û
karibe qetabê xwe li yên
neyaran bide, berê xwe bide
zalim û zordaran, ne diyar e.
Ne beg serê xwe bi rewşê re
diêşînin, ne jî alimên dînî û
ne jî dewlemend û xwedî
milk û xanedan.

MİRHEM YİĞİT

Mirov hene dibin serbilindahî, baweriya bi xwe, xurtî û piştqewînî ji bo neteweyen xwe, mirovayetiya serdema xwe û mirovî piştî xwe.

Mirovîn baş, rewşenbîrên hêja û şexsiyetên di xizmeta ilm û qenciyê de zû bi zû ew çendî ew neteweyîstir, tevâyîtir û dînyayîtir dibin.

Kurdistan, ne pir jî be, bûye dayik û pîrika mirovîn birûmet, mirovîn xwedîgotin û xwedîwezn.


Li welatê me kesen ku navê Cegerxwîn nebihistibin, ji nêzik an ji dûr ve Cegerxwîn nas nekin bi taybetî li Başûrê Biçük û Bakur kêm in.

Her wekî wê di bîra beşek ji xwendavanê Azadiya Welat de jî bê, 22'ye meha kewçêrê roja wefata Seydayê Cegerxwîn e. Bi vê minasebetê em dixwazin hineki behsa gundê Cegerxwîn Hesarê, herêma wî Hesenkêf bikin û hineki jî faktörênu ku ew afîrandine mûmâgeşe bikin.

Hesar gundê Seydayê Cegerxwîn e, Seydayê welatparêz li Hesarê hatiye dînyayê. Hesar, dikeve navbera Kerços û Hesenkêf.

Li herêma Mêrdînê gundê Hesarê bi qasî qezayen li vir, tê maskirin. Kesen ji Mêrdînê têne zanîn. Sebeb jî ne bi tenê ew e ku Hesar bi Cegerxwîn nas û popüler bûye. Sebebek din jî heye. Ew jî ev e: Demeke dirêj das û qeynaxêni bi hezaran paleyênGIS wilayeta Mêrdînê û heta bi sedan gundê Başûrê Biçük li seranserê Cizîre, li Hesarê çedibûn, şeqil û navê Hesarê hildigirtin.

Li herêma binavkiri, havînan wextê paleya ceh û genim tu bi ku de biçûyayî, tu têketayî nav kîjan erdî û te berê xwe bida bin kîjan konê paleyan, te dê müheqeq das û qeynaxêni hesarı di desten paleyan de biditana. Paleyên ji xwe pişrast û çavziwa mîna Hemo Pale û



Ehmed Şemri, xortêng germ û nûhatî ku baq dihonandin û di ser serê xwe re davetin û baqê wan xera nedibûn, sermelik û hogêna baqê xwe lê dixistin û dişandin malê; li mal dikutan, dihertin, dikirin ard û hevir, pişt re bi tenûrê vedidan û dikirin nan û dawî nanê wî jê redihat, hê nû radibû, hê nû pişt xwe rast dikir û nanê xwe dixwar, GIS di desten wan de dasen Hesarê û qeynaxêni Hesarê hebûn.

Paleyên li dora genim dibûn çerxeçî û bi tatikî lê dixistin, paleyên erden ne seri û ne binî hebû û çend rojan de li erde radixistin, çek û zirxê wan bi tenê ev aleten hesarı bûn.

Merkezeke navdar Hesenkêf

Hesar wekî hate gotin di erdê Hesenkêfe de ye û ji awira dîrokî ve parçeyek ji vir e. Hesenkêf merkezek ji navdartirin merkezen Mezopotamayê ye û ji awira kulturi, dîrokî û edebî ve geleki dewlemend e. Xizmet û şuxra ve merkezê ji bo mirovayetiye bêpîvan e. Lî vir, li Hesenkêf gelek kultur û gellek çemên kulturi pêrgî hev bûne û di nav av û şetekî mezinir de ketine nav hev, hev gur kirine, hev bi hêztir kirine

û li GIS Rojhilata Navîn belav bûne. Gelek ji xelk û baxîren komik û neteweyen iro hev û din li Mezopotamayê, li Hesenkêf nasîne, qetabê xwe li hev xistine û her yekî ji wan ji bo me rengek, tehm û zewqek hiştiye, bûye gul û sosinek di vê perqa bêser û bêbinî de.

Eser û berhemên dîrokî, birc û sera, eywan û pirên kevnar, keleb û bedenên zemanen derbasbûyi, şop û dewsên hejmarek xelk, ziman û folklor hildigirin û her yek ji wan rêzek e di vê avahiya kevnar, mermerî û entike de.

Di avakirin û parastina van berheman de xwêdana kurdan, asûri-suryaniyan, kildanî û ermeniyan û pir xelkîn din heye. Û bêguman Hesenkêf bajarek ji bajaren heri kevn e li Kurdistanê. Ev bajar ji zemanê Roma û Bizansan û bi vir de, di zemanê mîrwanî û eyûbiyan de tim bûye merkezeke idarî û rola xwe listiye.

Cegerxwîn li vê birekî, di nav vê kelepor, dîrok, kultur û mozaïka reng û damaran de çavên xwe vedike, dor û berên xwe û dînyayê nas dike. Dara Cegerxwîn di bin bandor û tesîra vê rastiya hesenkêfi û mezopotamayê de di nav sal û dehsalên zemân de bejn dike, stûr û xwegir dike.

Sexsiyet û rewşenbîriya Cegerxwîn hesenkêfi û mezopotamayî ye. Ji vir fişik bûye û ji vir bi xwedî bûye. Orjinalite û reha wî li vir e, heta bi vir dike û torinê vê malbatê û vi bavikî ye li cihanê.

Malbatê koçbûyi zêdetir hesas in

Faktor, haveyn û hevirtirşekî din ku di mesela hevîrê seyda de xwedîgotin e, her çendî ne pir diyar û nependî ye ji ew jî pêşiyen Cegerxwîn in. Pêşiyen Cegerxwîn ji jortir daketine. Li gorî ku Apê Osman Sebrî dibêje, malbata Seydayê Cegerxwîn berî bi çend bavikan ji Gurdilê xwe berdane Hesarê.

Dîroka sosyoloji û zanyariya civaki ne carekê, belê pir caran ne bi nimûneyekî û du-sê nimûneyan, belê bi dehan nimûneyan îspat kiriye ku malbatê koçber dibin û cihen xwe ji sebebekî ji sebeban diguherin, ji dora xwe hineki hesastir û nîşmîstir in. Malbatê wiha xwedî serpêhatî û zaneşitexalî ne. Biwens û sohbetxwes in. Şevbuhêr û wextbuhe in. Ü di jiyana wan de peyv û gotin û behskirina jiyana xwe, cihekî xurt digire û ev jî dibe zemîn û binaxeke objektif ku ji nav malbat û qebileyên wiha mirovîn dengbêj, kesen hûnermerd, çirokbêj, şair, romanivis û nîşkar derdikevin.

Malbata romanivisê navdar Yaşar Kemal ji ber şerê Rûsyâ û Tirkîye bar dike û tê Edeneyê. Ya Yilmaz Güney jî wiha: Aliyê dê, ji dora Mûşê ne ü aliyê bavê ji ji dora Siwerekê ne. Herdu demar jî, yek ji ber şer û ya din ji ber xezanîye xwe li deşta Yeniceyê digirin û xwe diavêjin sînga Edeneyê. Ez ne şaş bim û baş di bala min de mabe, rewşa rejîsor û nîşkarê dengpêketi Elia Kazan, nîşkarê mezin George Orwell, nîşkarê yewnanî Dido Sotiryo, Selman Ruşdi û gelek nîşkar hunermendê din jî wiha ye.

Faktorekî sêyemîn ku rasterastir û bêmunaqeşetir Cegerxwîn kiriye Cegerxwîn, salen feqetiya wî, gera li Kurdistanê, bi başî û xerabiyen wî, bi zara va û devokên wî û bi mûzik û folklorâ wî, naskirina gelê kurd e.

Di van salan de çavên seyda vedi bin. Ziman, zanebûn û ferhenga wî xun dibe. Rewşenbîr û alimên kurd nas dike. Dibe haydarê Melayê Cizîri, Feqiyê Teyran û Xanî, xebera wî ji mirovîn mîna Nalî û Hecî Qadirê Koyî dibe û bi iştîmaleke mezin dibe aşınayê wan. Her wiha bîvê nevî, kêm ya zêde li serrewş û pergala neteweyen cîran, neteweyen tirk, ereb û faris û xelkîn din yêni li Kurdistanê ji, mîna ermeniyan dibe xwedî pêzanîn.